kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

# bîrnebûn

ZIVISTAN/2009



GERA LI DÛ KOKA XWE:
MIKAÎLÎYÊN WAN Û AGIRÎYÊ

EŞÎRA BİLİKAN

DAWETÊN DEMA NÛ

GİZLİ BELGELER IŞIĞINDA
DERSİM'DE KATLİAM VE ASİMİLASYON

40

www.arsivakurdi.org

# bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

**Utges av Apec-Förlag AB**

**Hejmar 40 zivistan 2009**
**Ansvarig utgivare**
Ali Çiftçi

**Redaksiyon**
A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

**Adress**
Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
**Telefaks:** 0046-(0)8-761 24 90

**E-post**
info@birnebun.com

**Internet**
www.birnebun.com

**Têkilî/İlişki**
**Danimarka:** Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83
**Avusturya:** Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

**Belavkirin / Dağıtım**
**Ewrupa:** Muzaffer Özgür/Bîrnebûn
Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara**:**
Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32
KIZILAY / ANKARA
Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center
Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A
Polatlı-Ankara
Tfn.: 0090-312-622 94 36

**İstanbul:** Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

**Biha/Fiyatı**
Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

**Abone**
Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

**İsveç hesap numarası**
(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

**Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için**
APEC, "Bîrnebûn" PlusGirot-Stockholm/Sweden
BIC: NDEASESS
IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

**Çap / Baskı**
Apec-Tryck AB





Ji pîroziya **21ê Sibatê,** ***Roja Zimanê Zikmakî*** li dibistana Tallid a Fittjayê

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

www.arsivakurdi.org

# NAVEROK / İÇİNDEKİLER



Wêneya li berg: ji firca Bekir Dari








2 Gerek dewlet ziman û nasnameya kurdan bi rêya qanûnî biparêze! **Ali Çiftçi**

4 Helbijartina Herêmî / Yerel Seçim

5 Roja zimanê zikmakî û zarokên kurdên Anatoliyê, **Mehmet Balta**

7 TRT 6: Dewleta tirk heqê weşana bi zimanê kurmancî da xwe! **Nuh Ateş**

10 Xelatgirê xelata edebiyata Nobela sala 2009an

11 Gera li dû koka xwe Mikaîlîyê Wan û Agirîyê, **Dr Mikaîlî**

33 Dawetên dema nû, **Muzaffer Özgür**

37 Li ser daxkirinê, **Altun Başaran**

38 Li ser romana Yusuf Yeşîloz, **Bettîna Spoerrî**

39 Şopa zengilê dil, **Xizan Şîlan**

41 Di şerê Çanakkaleyê de ciwanên kurd, **Rohat Alakom**

45 Eşîra Bilikan, **Nuh Ateş**

51 Allê Oxçî, **Bekir Dari**

60 Derewîn, **Seyfî Doğan**

63 Sucê bê bexşê, **Seyfi Doğan**

64 Çend gotin li ser Newrozê, **Jordan**

65 Min tu nedîyî, **Mem Xelîkan**

69 Wê malê şeş lavikên xwe hene, **Ahmed Gezer**

71 Oy oy etê, **Gürsel Dayan (Qemerî)**

72 Danasîna kitêban

75 Gizli Belgeler Işığında Dersim`de Katliam ve Asimilasyon **Mehmet Bayrak**






www.arsivakurdi.org

# Gerek dewlet ziman û nasnameya kurdan bi rêya qanûnî biparêze!

Bi krîza abori re em bi gelek bûyerên balkêş û guhartinên nû ve ketin sala 2009an. Senator Obama yekem amerîkiyê afrîqî ye ku bû serokê Amerîkayê. Birêz Obama li meha yek ya sala 2009an wek serok dest bi karê xwe kir. Bi hilbijartina serok Obama re li seranserê dunyayê bi taybetî di nav gelên bindest de hêviyeka nû bi guhertinên nû ve hatiye girêdan.

Kurdên bakur jî ji hêvî û destkevtiyên nû re rû bi rû dibin. Bi destpêka serê salê re televîzyona Turkiyê ya fermî, TRTê bi navê TRT6ê dest bi weşana zimanê kurdî kir. Herçiqas navê kurdî lê nehatiye kirin jî bernameyên xwe bi tevayê bi kurdî ne. Lê navê fermî *Kanala Pirzimanî* lê hatiye kirin.

Li ser vê bûyerê ku di dîroka kurdên bakur û dewleta Tirkiyê de yekem car e, qenaleke televîzyonê bi zimanê kurdî weşanê dike. Ev yeka bi serê xwe dîrokî ye. Ev zimanê ku hê jî di resmîyeta(fermî) dewleta Tirkiyê de tu zimanekê wiha tuneye û nayê qebul kirin, ew zimanê ku hê do serokdewletê Tirkiye birêz Tayip Erdogan digot; *çênabe bi wî zimanî perwerde bibe* û zimanekî paşdemayî dihat dîtin. A niha jî ji nîşke ve 24 saetan pê weşanên di her warî de tê kirin. Programên agahdarî yên civakî, zanistî, edebî, sohbet, folklorîk, xeber, muzîk, dîrokî û heta programên zarokan têne weşandin.

Li ser TRT6ê di çapemeniya kurdan de pir dîtinên ji hev pir cudatir hatin nivisîn. Helbet bi bûyereka wiha re dîtinên ji hev cuda tiştekî bir normal e.

A niha tiştek eşkere bû, ew dîtina dewletê ya fermî ku zimanê kurdî heta niha înkar dikir û ji bo ku ew ziman ji holê rabe çi ji destê xwe hat, kir. Asîmilesyona herî dijwar li hember gelê kurd û zimanê wî bikaranî. Zarokên kurdan bi wê politîkaya xwe ya înkarî zêdeyî 80ê salî ye, asîmîle dike û ji ber berjewendiyên xwe yên rojane, îro radibe bo xwe bi kar tîne. Eger ev ne ji bo berjewendiyên xwe yên rojane be, divê berê hertiştî li hember wî xelkî ku bi salan hebûna wan, kesayetîya wan înkar kiriye, bi daxûyanîyeka fermî, hem lêborina xwe bixwesta û hem jî navê wî zimanî rast lê bikira!

Ne tenê ji bo televîzyona TRT ya fermî, herwiha divê ew ziman bi qanûnî bi-



www.arsivakurdi.org

hata parastin, rê û destûr bo hemû kanalên din bihata dayîn.

Ku dewlet, hêz an jî partiyeke li Tirkîyê bi rastî jî bixweze pirsgirêka gelê kurd û zimanê kurdî çareser bike, divê ev heq û parastina zimanê kurdî bi qanûnî rê jê re veke û di çarçeweya qanûnekê de biparêze. Çawa zimanê tirkî bi rêya qanûnê hatiye parastin, divê zimanê kurdî jî wusa were parastin. Ne tenê weşanên radyo û televîzyonî, ya herî girîng dîsan bi rêya qanûnî perwerdeya bi zimanê kurdî jî wek heqê her zarokekî/a kurd bêt parastin.

Îro ku ev destkevtî bo zimanê kurdî vebûye ji ber berxwedan û têkoşîna gelî kurd û dewlemendîya kewneşopiyên gelê kurd bi xwe ye. Divê ev tişt neyê ji bîr kirin!

Erê, armanca dewletê çi dibe bila bibe, ma gelo ev weşan bo kurda dê çi bide? Ev pirseka ku divê baş li ser bêt rawestin.

Bi ya me, bi vê weşanê re naskirin û erênîkirina zimanê kurdî herçiqas îro fermî nahatiye qebulkirin jî politika xwe ya înkariya 80 salî zîdetir inkar kir û ew qedexekirin û înkariya zimanê kurdî hat şikandin!

Bi vê bûyerê re rê û îmkan dê bên vekirin bo pêşdabirin û parastina zimanê kurdî. Ev heqê gelê kurd e ku heta niha pir bi derengî maye!

Em wek gelê kurd nikarin spasdarên dewletê bin, divê em spasdarê wan kesan bin ku bi rastî dixwezin heqên kurdan bi rêya qanûnî bên dayîn, zimanê kurdî jî bêt parastin. Herwiha heqê me ye em ji dewletê bixwazin ku ew bi tevayî lêborînê ji gelî kurd bixwaze. Ji ber ku îro piranîya kurdan li Tirkiyê ji aliyê zimên de hatine qetilkirin.

Xwendevanên birêz, hûn ê di vê hejmarê de dîsa çend nivîsên balkêş bixwînin: Li ser mikaîlîyan gername û lêgerîneke dirêj û hêja, ferqa dawetên kevn û nû, lêkolîna li ser ciwanên kurdên ku beşdarî şerê Çanakkaleyê bûne, lêkolîneke li ser eşîra bilikan, çîrok û metelokên folklorîk... û ji pênûsa Bekir Darî û Xizan Şîlan du kurteçîrokên hunerî û hwd... Herweha di beşa tirkî de jî dîsa weke hertim, birêz Mehmet Bayrak ji bo vê hejmara me ya nû li ser qetlîama Dersimê bi belgeyên veşartî bi me re ye.

Bi hêvîya buhareke rengîn, em demsala hejmara zivistanê jî li dû xwe dihêlin.

Ev roja ku me amadekariya kovarê dikir, xebereke ne xweş hat ku bavê endamê redeksiyona me Hecî Erdoğan çûye rexmetê. Rehma Xwedê lê be û ciyê wî cennet be! Li vir li ser navê redaksiyonê em ji birêz Hecî û malbata wî re dibên: bila serê we sax be!

Ev hejmara jî tê de, ji vira ha kovara me bideng jî li ser CD tê weşandin. Kes an dezgehên ku bixwezin, dikarin sparişa xwe wek abonetiya bideng bidin.

**Ali Çiftçi**



www.arsivakurdi.org

## Helbijartina Herêmî/ BANG:

**DENGÊ XWE BİDİN NAMZETÊN KU QEDRÊ NASNAMA KURDAN DİZANİN!**

Roja 29ê adara 2009an li Tirkîyê helbijartina herêmî heye. Di vê helbijartinê da serdar, azayên bajar û dîwanên wan û yên herêmî yê werin helbijartin. Wê rojê helbijêrin herin ser sindoqan û dengê xwe bidin.

Helbijartinên herêmî(şaredar/muxtaran) ji bo başîdareya di cîh da, demokrasîya nêzikî xelkê û rêlêkirina derd û dexwazên herêmî giring in. Ji serketina di van xalan da, helbijartina namzetên durist, fedekar, azad, aştîxwaz û di karê xwe da jêhatî gerek in.

Namzedê baş, gerek e ku terefdarê wekhewî û adîl be û heqê jin û feqîr, kom û xelkên bindest biparêze.

Divê ji namzetan zanîna qedra ziman û nasnameya kurdî were payîn û xwestin.

Ji ber vê yekê; em rêxistin û sazîyên kurdên Anatolîyê bangî helbijêrên li Anatolîyayê dikin ku ew dengên xwe bidin namzetên ku qedra ziman û nasnameya kurdî dizanin.

**DENGÊ XWE BİDİN NAMZETÊN KU QEDRÊ NASNAMA KURDAN DİZANİN!**

## Yerel Seçim / ÇAĞRI:

**OYUNUZU KÜRT KİMLİĞİNE SAYGI DUYAN ADAYLARA VERİN!**

29 Mart 2009 Mahalli İdareler Seçimleri için seçmen sandık başına gidip oyunu kullanacak.

Mahalli İdareler Seçimi demokrasi kültürünün ve geleneklerinin yerleşmesi en küçük yerleşim biriminden başlar. Katılımcı, dürüst yönetim anlayışını yaşama geçirmek için önemli bir fırsattır.

Seçimlerle sınırlı kalmayan bir katılımcılık anlayışı ile şeffaflık sağlanması kültürel ve sosyal politikaların geliştirilmesi de yerel yönetimlerin görevleri arasındadır. Her şeyden önce adayların dürüst, deneyimli ve yerel düzeyde de halkın ve örgütlü toplum kesimlerinin yabancısı olmayan, her türlü feodal bağlardan arınmış ve aşiretçiliğe pirim vermeyen kişiler olması son derece önem taşımaktadır.

Halk yolsuzluklardan, kayırmacılıktan ve bunlara göz yuman yerel yöneticilerden bıkmış durumdadır. Temiz siyaset, temiz ve saydam yerel yönetim istemektedir. Kültür mirasının korunması ve gelecek nesillere ulaştırılması için kamusal girişim gereklidir. Kültür mirasının korunması ve iletilmesi için ekonomik ve idare imkanların oluşturulmalı. Unutulmamalı ki kültürmirası kimliği toplumun ve bireyin en önemli ögesidir.

**OYUNUZU KÜRT KİMLİĞİNE SAYGI DUYAN ADAYLARA VERİN!**

KOVARA BÎRNEBÛNÊ - WEQFA KURDÊN ANATOLÎYAYÊ LÎ SWÊDÊ - KOMELA ZİMAN LÎ ELMANYAYÊ

13.02.2009



www.arsivakurdi.org

# ROJA ZIMANÊ ZIKMAKÎ Û ZAROKÊN KURDÊN ANATOLÎYÊ

Mehmet Hakki Balta




21 ê Sibatê
21 ê Adarê
û 21.

Hin dem hene evînê bi êşan dilefîne, tîne ber dilê mirovan. Hin dem hene, dema tên bîra mirov histiran dişimitînin ser dilan. Hin dem jî hene ku di wan deman de dil ji ber evînê dixwaze ji qefesa sîng bifire.

Wek dema Newrozê, wek dema Komara Mahabadê, wek dema 21ê sibatê an jî nimroya 21ê . Ev hersê jî dil didin ber dilê min. Zimanê min, dewletbûna gelê min, sersala min û bajarê ku li wir ez hatime dinyayê(Amed) tînin ber çavên min. Ma ji vana xweştir jî tu tişt hene? Roja zimanê zikmakî jî ji bo min ji wan rojan yek e. Baş e ku UNESCO yê (1999) ev roj kirîye roja zimanê zikmakî.

21 Sibatê wek dema Newrozê her tim bi heyecaneke mezin dibastana ku ez tê de kar dikim dixe nava çalakiyan. Hefteyek berya 21ê sibatê dibistan di nava liveke taybetî de gav bi gav reng diguhirîne.

Nivîs, gotin, helbest, çîrok, mamik, stran bi zimanên curbecur (19 ziman) di destên şagirdan de wek alên wan di navbera sinifên wan û sinifên mamosteyên zimanên zikmakî de diçin û tên. Hefteya temaya ***Zimanê zikmakî*** bi van livan dest pê dike. Şagird di nav  çalakiyan de ne. Helbest, stran, û çîrokên bi zimanê dibêjin û werdigerînin swêdî.  Govende xwe yên netewî digrên.Benda wê roja mezin in. Xwe amade dikin. Grubên govend û stranan her roj îdman dikin.

Mitfaxa dibistanê jî di nava livên pît de li du xwarinên welatên din e. Ji bo wê rojê xwarinên welat ya jî çandên din çêdikin. An jî her şagird wê rojê ji mala xwe cureyêk xwarina ji çanda  xwe tîne. Li



www.arsivakurd.org

xwaringehê xwarinên ji çand û welatên cuda cuda li ser maseyan rêz dibin. Dilê kê kîjan xwarinê bixwaze ji wan xwarinan dixwe.

Li ser şanoyê helbest bi gelek zimanan têne xwendin. Bi zimanên cuda zarok disitirin. Wergerên nivîsan li derûdor bi wêne, al û nexşeyên welatan dîwaran dixemilînin. Nivîs bi alfebeyên cuda bi alê wan welatan têne xemilandin. Zarok bi evîn bi kêf in.

Di dibistana Tallidê de jî her rojên zimanên zikmakî rengûreng e. Sêsed şagirdên dibistanê hene. Nêzî 120ê şagirdên kurd di vê dibistanê de dixwînin. Nêzî 100 şagirdên kurd diçine dersên zimanê zikmakî. Her hefte 19 mamosteyên zimanên zikmakî yên ji 19 zimanan têne dibistanê bi zimanên xwe ders didin zarokên ku bi zimanên wan dizanin. Bi erebî, urduyî, asurî, ermenî, îspanyolî, mandarînî û hw. Di vê dibistanê de ev bîst sal in ku ez wek mamosteyê zimanê kurdî bi zaravayê kurmancî kar dikim.

Şagirdên ku têne dersa zimanê zikmakî ji sedî 98ê wan kurdên Anatolîya Navîn, ji derûdora bajarê Konyayê ne.



Belê kurdên Anatolîya Navîn, ew kurdên ku bi sedan salan e li axa biyanîyan bi înad ziman û çanda xwe parastine. Niha jî li Evrûpayê, li Swêdê ziman û çanda xwe diparêzin. Bi kurdî dijîn, bi kurdî deng dikin, bi kurdî stranên xwe guhdar dikin, bi kurdî dilivin.

Di van rojan de zarokên wan bi stran, helbest, çîrok beşdarê cejnan dibin. Govendên kurdî dikşînin. Li ser şanoya dibistanê bi kurdî helbestan dixwînin, stranan dibêjin. Û malbatên wan bi alîkariyên xwe gelê xwe û kultura kurdî bi serfîrazî di nava grûbên din de temsîl dikin.



Fermo: Yên li ser şanoyê ku civînê îdare dikin, programê pêşkeş dikin du zarokên kurd in. Ciwan û Ayşegul. Di nava grubên govend û stranan de bi piranî zarokên kurd in.

Bi kurdiyek xweşik roja 21ê sibatê, roja ***Zimanê zikmakî*** li hemû mirovan pîroz dikin.

Roja zimanê dayîkê li we, li xwendevanên **Bîrnebûn**ê jî pîroz be!

# TRT 6: DEWLETA TİRK HEQÊ WEŞANA Bİ KURMANCÎ DA XWE!

Nuh Ateş

**Manewreyeke sîyasî**

Ji ber zora konjuktura sîyasî, faktorên navxweyî û dervayî serdarîya Tirkîyê serê salê ji nişkava gavek avêt û li ser fermana wê qenalekî TRT dest bi weşana bi zimanê kurmancî kir. Ku meriv li şekla amadekirina vê projeyê û li programê wê mêz dike, ew nikane ji xêyrî manewrayeke sîyasî navekî din li wê bike.

Çima serdarîya Tirkîyeyê di vê konaxê da pêwîst dît ku rê li ber weşana bi kurmancî di qenalê televîzyonê dewlêtê TRT de vebike?

Tirkîye di mijara çareserkirina pirsa kurdî da zûva ye ku di tengîyê da ye, bi gotineke din rê li ber wê xetimî bû. Ew li her derê, çi li hundur û çi li derva dibû miheteba rexneyan û ji alîyê sîyasî da her dem di pozîsyoneke defensîv da bû. Wê bi vê gavavêtinê xwest ku însîyatîfa sîyasî bi dest xe û pê rê li ber xwestekên kurmancan yên sîyasî û bingehî bigrê.

**Ma çima va gava û ne yeke din?**

Kurmanc û dinya û alêm li bendê bûn ku Tirkîyê rêxistinên kurmanca yên sîyasî û sivîl mihetab qebûl bike û daxwazên kurdan bîcîh bîne.

Ma xêr e serdarîya Tirkîyeyê bi van diwazên kurmancan negirtiye?:

– Qebulkirina kurmancan mîna xelkekî cihê û bi serî xwe!

– Zimanê kurmancî jî li Kurdistanê zimanê resmî be û perwerdeya bi kurmancî ferz be!

– Navên bajar û herêmên bajarokan yên bi kurmancî bi fermî bin!

– Partîyên sîyasî bi nav û nasnameya kurmancî serbest bin!

– Efeke sîyasî ji bo mehkûmên di zîndanan da û li derî welat bê êlan kirin!

– Mafê referandûmê li ser pirsa îdarekirina xwebixwe bê dayîn!

Serdarîya Tirkîyê bi van daxwazan nagire û di ser van ra bazdide û dêst diavê weşana bi kurmancî di TRT da. Ma çima ew zimanê kurdî di qada

www.arsivakurdi.org

resmî da û li ser bingeheke qanûnî qebûl nake? Hîngê pirsa weşana kurmancî di TV û Radyo da jî dê bixwe hal bibe û nakeve monopola dewletê. Ger serdarîya dewletê di vê gavavêtina xwe da durist bûya, divîya bû ku wê partî û rêxistinê kurmancan, qet nebê Kürt-Kav û Enstîtuya Kurdî wekî mihetab bidîya. Ji vê meriv dikane derbixe ku tu nêt û armanca serdarîya dewlêtê li ser mijara bicîkirina daxwazên kurmancan tuneye. Eksî nêta wê bi weşana bi kurmancî di qenalê televîzyonê dewletê TRT da ew e ku rê li ber xwaztekên kurmancan yên sîyasî bigre û zor û barên li ser xwe yên ji alîyê têkoşîna kurmancan û raya giştî ya demokrat da sifik bike. Ku meriv mêla xwe bide reaksîyonên raya gîştî û mineqeşeyên nav kurmancan yên li ser vê mijarê û bi taybetî jî matmayî û pesnên ji alîyên hinek elîtên kurmancan va dê bibîne ku serdarîya Tirkîyê bi vê manewraya sîyasî heta derecekî serketî bûye.

**Gaveke hêsan, kêmrîsk û bitîn**

Wer xuya dike ku serdarîya Tirkîyeyê û berdevkên wê di vê konaxê da gavavêtinek hewce dîtine û li ser wê hûr û kûr şêwirîne. Wan li dawîyê li ser gaveke hêsan, kêmrîsk û bitîn biryar dane û ji bo vê, weşana bi kurmancî di qenalê televîzyona dewletê, TRT da minasib dîtine. Çunkî ji bo vê projeyê danîn an guhêrtina qanûnên ne pêwîst e yan pêwîst nedîtine û duzanameya RÜTÜKê têrkirî hatîye dîtin. Dîsa wana bi vê rê heqê monopola weşana bi kurmancî dane dewletê û bi vê jî helwestên din yên monopolperest legîtîme dikin. Her kes dizane ku weşana televîzyonê bitîn e û meriv dikane pê xwe bigîhîne bi milyonan sêyrdaran, ango ew ji bo propagandayê û qezenckirina reyan hacetekî têrkêr e. Lewma wan ev projeya helbijêrîne. Hewceyî gotinê ye ku bingeha vê projeyê ji alîyê qanûnî da ne pît e û guman heye ku ew têk jî here.

**Programeke malbatkî ji bo armanceke sîyasî**

Bi gotina serdarê TRT Îbrahîm Şahîn armanca TRT ya gîştî hûkirina zimanê tirkî ye û weşana bi kurmancî jî ji bo kurmancên tirkînezan hatiye çêkirin. Şahîn programa weşana bi kurmancî di TRT 6ê da wekî programeke malbatî mîna yên di TRT yên din da bi nav dike: Kilam, sohbet, şahî, rêzefîlme wergerandî, deng û behs dê têda hebin. Ji van gotinan jî derdikeve meydanê ku armanca weşana bi kurmancî ne parêztin û pêşvaxistina ziman û kultura kurmancan e. Yanê weşaneke bi kurmancî û programeke malbatkî ji bo armancên sîyasî. Daxwaz û hêvî ew e ku bi kilam, reklam, sohbet û rêzefîlman yên ji siyasetê dûr sêyrdarên kurmanc ji pirs û daxwazên kurmancan yên ku di eslê xwe da sîyasî ne bi dûr kevin û bibin terefdarên dewletê û AKP.



www.arsivakurdi.org

**Weşaneke bi zimanekî nenas**

TRT6 bi kurmancî diweşîne lê kurmancî zimanekî ne serbest e. Di tu belgeyên fermî da navê kurmancî derbas nabe. Devên resmî wî di bin navê "zar û zarawayên cîwarî" da heldidin. Di protokolên meclîsê da kurmancî rewayî navê "zimanekî nenas" tê dîtin. Di mehkeme û mekteban da bikaranîna wî ne serbest e. Di vekirinaa weşana TRT6ê da jî navê wî neheta heldan. Serokwezîr Erdoğan gotibû "*TRT6 bi xêr be!*" Wî nexwest yan şik nebir ku bibê "weşana bi kurmancî bi xêr be!"

Di zîhnîyeta qedexeperest ya dewlet û hukumeta AKP da tu guhertin çênebûye. Yanê heyamê înkarîya hebûna xelkê kurmanc û zimanê wî didome. Di bin van şertan da kanala televîzyona dewletê bi kurmancî diweşîne.

**Ma va ne sêreke di ser sêran ra ye?**

Bêşik weşaneke ha dê sansurbar û bendkirî be. Qiymetdayîna zimanên ji xêyrî tirkî ew e ku zemînekî qanûnî ji bo hînbûn û bikaranîna wan di her qada jîyanê da bê deynin. Lê wana çarçaveke weng hewce nedîtine.

**Gaveke bi armanceke nerênî û encameke erênî**

Ji kîjan hêlê da lê binêrî, TRT6 wekî dezgeha manewreyeke sîyasî hatiye amadekirin. Ew ê bi armanca paşvaxistina daxwazên kurmancan yên sîyasî û bingehî bê bikaranîn. Û ew ê li hember televîzyonên kurmancan û zêdetir jî li hember *Kurd 1ê* bê bikaranîn. Lewma bi lez û bi dengekî bilind erêni mêrandina vê projeyê ji alîyê partî, sazî û kesetîyên kurmanc da şaş e. Gerek e ku ronakbîr û hunermendên kurmanc yên bi nav û deng alîkarîya wê nekin. Rewa ye ku meriv wê ji alîyê sîyasî da wekî projeyeke nerênî binav bike. Mitalekirina vê projeyê wekî encameke rasterast ya têkoşîna kurmancan çiqas rast e? Ku weng be, hîngê çima dewlet sewa xatirê têkoşîna kurmanca yan jî ji ber zor û qudreta wê rê li ber perwerdeya bi kurmancî venake? Ji dijderketinê mexsed ew e ku meriv nêt û armancên li paş vê gavê aşkere û teşhîr bike.

Encax ji alîyê zimên da, encamên erênî yên weşana bi kurmancî di televîzyona dewletê da hene. Meriv dikane bibê, herçiqas ku ne bi dilê xwedîyan be jî, ji vê projeya bi armanceke nerênî encameke erênî derket. Bi weşana bi kurmancî di TRT6ê da dewlet rûreşîya xwe ya 85 salan li xwe dine û siyaseta xwe ya asîmîlekar û zimankûj pûç dike. Bi vê jî guman heye ku tîn û têsîra tirs û tabûyên li ser kurmancîyê û dengkirin û hêvîsîna wî kêm bibe û îmaja kurmancîyê bilind bibe. Gerek e ku meriv vê erênîya nexwestî piçûk nebîne. Ji ber vê şaş e ku meriv kesên ku di TRT6ê da kar dikin bi xêrnexwazî yan xayîntî sucdar bike. Rexne li wan kirin divê bi kêr û hêşarkirî be.

*Elmanya, 06.02.2009*



www.arsivakurdi.org

# Xelatgirê xelata edebiyata nobela sala 2008

**Jean-Marie Gustave Le Clézio**

13 nîsana 1940ê li Nice hatiye dunyayê. Koka dê û bavê wî ji Mauritiusê ye. Le Clézio di heşt saliya xwe de bi malbata xwe re bar dike Nîjerîyayê. Piştî Şerê Duyem bavê wî wek doktor li wir dimîne. Rêwîtiya wî ya ku bi gemiyê mehekê çûbû Nîjeryayê, bûye destpêka kariyera wî ya niviskariyê. Di vê rêwitîya xwe ya dûr û dirêj de, du kitêbên biçûk bi navê ***Un long voyage*** och ***Oradi noir*** bi berhev aniye û daye weşandin.

Ew bi du zimanan mezin bûye: farnsî û îngîlîzî. Di sala 1950î de tev malbata xwe bi paş ve vedigere Nice. 1957an de lîsyê xilas dike û di sala 1958 -59an de li Bistolê, di 1960-61an de jî li Londonê îngîlîzî dixwîne. Eksama xwe ya bingehîn li Instituta d'Études Littéraireyê di 1963an de dide. Dîploma xwe ya bilind jî li universîteya Aix-en-Provenceyê di 1964an de, teza xwe ya doktorayê jî li ser dîroka Meksîkaya kevn li unîversiteya Perpignanê di 1983an de temam dike. Li unîversîteyên Bangkok, Meksîko City, Bosto, Austin och Albuquerqueyê dersan dide.

Le Clézio bi nivîsandina essay, novel û romanên xwe kariyera xwe ava kiriye. Bi nivisandinên xwe yên pêşîn li ser xeteka romana nû *"nouveau roman"* nêzî *Sartre* û *Camus* dibe.



Wêne ji arşîva Akademiya nobelê

Mijar û vebêjerên berhemên wî bêtir ên gelên bindest, kolonî û derbederên welatên xwe ne. Le Clézio bi ruh û rastiya mijar û vebêjerên xwe rexneyên vekirî û veşarî li welatên ewrûpî dike ku ew bi ruhên xwe, bi mentaliteyên xwe nikanin ji kaînetê û ji kulturên cihêreng hez bikin.

Le Clézio romana xwe ya pêşîn *Le procès-verbal* di sala 1963an de û di pey re jî gelek berhemên din nivîsand.

Le Clézio bi romana xwe ya ***Désert*** (1988) karîyera romanivîsiya xwe xwûrttir kir û bi wê romana xwe jî xelata Akademiya Fransayê wergirt.

Xelatgiriya edebiyata nobelê ya sala 2008an jî wek ku me dît, bû para Le Clézio.

www.arsivakurdi.org

# GERA LI DÛ KOKA XWE MIKAÎLÎYÊ WAN Û AGIRÎYÊ

Dr. Mikaîlî

www.arsivakurdi.org

Heryek ji me dizane ku ji berê da li Anatoliya Navîn, li gund û bajarên ku çend kurd dihatin ba hev, şor ê tim çerx bibûya û bihata ser kokê. Ka em ji ku hatine, kînga hatine, wekhevî û cudatîya me bi kurmancên din va çi ne, çi ninin, ew tiştana ê bihatana qalkirin.

Deh sal berî vê ku me dest bi derxistina Bîrnebûne kir, yek ji sebeba me, yan jî ya min, ew bû ku em bersiva vê pirsê bidin. Ew rêyeke dûr û dirêj bû, ew di wê wextê da xewnek bû, lê me dest pê kir. Ji wê royê heta îro pir gav hatin avêtin, gelek tiştên hîn nû hatin hûkirin.

Ez dixwazim li vir ji we re qala gera li du koka bingeha mala xwe û Mikaîlîya bikim. Ji ber ku min zêdetir li ser wan lê pirsî û lê kola ye.

Li dû çêkirina malpera gundî me ya internetê, ji Mikaîlîyên din çend mesaj hatin. Yên ku têda digotin; Em jî Mikaîlî ne!, Em ji Ercişê-Wanê ne, Agirîyê ne, Hamur, Tutak û Çaldıranê ne!

Min berê jî hindik tişt li ser wan bîhîstîbûn û xwendîbûn, lê bi tu kesekî Mikaîlî va nedabû û nestandû bû. Bi hatina wan mesajana ketim coş û heyecanek bêhempa. Ma gera me, lêpirsîna me hindik hindik dihate dawîyê?

Lê tiştek hebû ku pir balkêş bû. Heta nika mezinê me, tim ji me re digotin ku ewna ji Vîranşehirê hatine (Bi wê Urfa difikirîn). Le hîn heta îro jî ji Urfa-Viranşehîrê tu kesi ji me re ne e-mailek, ne jî telefonek şandîye.

Ji ber ku di hîn çend çavkanîyên din da jî hatina Mikaîlîyan wek D. Beyazit dihat nivîsandin, ew bi ya min hîn realist e, nêzîkî rastîyê ye. (Binêrin; *Başbakanlık Arşiv Belgelerine Göre Osmanlı`da Cemaat, Oymak Aşîretler-Cevdet Türkay, Nuh Ateş- İç Anadolu Kürtleri, H. İbrahim Uçak, Tarih İçinde Haymana û Abdulkerim Doğru,-Tarih İçinde Polatlı).*

Ji boyî van faktorana jî min xwe bi wan telefon û têkiliyên ku ji Ercîş-Vanê û Agiri(Karaköse) hatibûn va, girt û

dest pê kir ji wan bipirsim ka ewna û em çiqas nêzî hev in? Ji kokekê ne yan na?

**HEVDÎTINA ME BI BIRÊZ HASAN FECRI ALPASLAN RA**

Di heyata meriyan da hîn tişt hene, wek tesaduf peyda diwin yan jî eger hûn îna dikin wek qeder e. Min navê birêz Fecri Alpaslan cara yekê di kitêwa Aşiret Raporları, da dît ku ew yek ji mezinên Mikaîlîyên Agirîyê ye. Dû re qederê li Elmanya xarzêkî wî va em kirin dost û heval. Wî jî min re got ku Mikaîlî xalanê bavî wî ne û bi tevayî li ser çîyayên Aladaxê dijîn û ji Hamur û Tutakê bigre heta Çaldıran û Ercişê terin.

Li ser vê yekê min li dû hin berhevkirina çend agahîyên din, informasyonên din, ji birêz Fecrî Aplaslan re telefon kir, min xwe da nasandin û jê re got ku ez ê bêm Tirkiyê û dixwazim wî nas bikim. Wî ew bi dilekî germ qebûl kir. Berî wê jî min bi hin çend Mikaîlîyên din ji Agiriyê va, bi rîya e-mailan û telefonan deng kiribû. Paşê eşkere bû ku ewna gîştik jî meri û xisimê hev in. Ji malikê ne...

Ez çûm Enqêrê, min ji birêz Fecrî re bi rîya telefonê hevdîtinek xwest. Me şora xwe da hev û ez çûm meqama wî. Ew li meqama xwe xadan şûneke bilind e. Wî ez li ber dêrî û bi awakî gelek germ hemêz kirim, xêrhatin li min kir. Ew cara yekê ji boyî min çiqas muhîm bû, girîng bû ez nikarim li vir bi rîya nivîsa, bi rîya peyva bînim ziman.

Bi rastî wexta ku wî ez hemêz kirim, min jî ew, germahîya apekî, pismamekî, birayekî hilgirt. Qasî çar saetan wî pirsî, min pirsî. Lê wextê qîm nekir, têrê nekir. Wî ji wir bangî birayî xwe Heci Xalit Begê û Mamoste Kasim û lawî xwe Ehmet Beg jî kir, em bi hevdu dan nasandin. Min dît ku ew yek ji bo wana jî balkêş û bi heyecan bû.

Çend ro şûn va wî, ez bi ew merivên xwe va dawetî xarinekê kirim. Em dîsa li Xwaringeha RECEP USTA çend saeta rûniştin û me qala Mikaîlîya kir. Di wir da ew eşkere bû;

Mikaîlî gîştik ji Bavekî ne, yanê malek in, dû re bi salan zêde bûne, bûne eşîreteke bi nav û deng. Serokatiya Ademîya (Adaman) jî bi salan di destî wan da bûye. Mikaîlîyê Agiri û Wanê berî 300 salî ji Îranê hatine. Pêşta li Erdîşê(Ercîş) bi cîh bûne û ji wir jî hînek ber bi Hamur û Tutaxê, hînek jî ber bi Çaldiranê ve çûne.

Di destî mikaîlîyên Agirîyê da secereyek gelek dûr û dirêj jî heye. Ew bi alîkariya birêz Servet Alpaslan hatiye çêkirin. Ez ê li vir wa secerana jî çap bikim û bi secera me va bidim ber hev. Ka di nav van de nêziktî heye yan na?



www.arsivakurdi.org

Bi gotina wana; ku Mîkaîlî ji Îranê hatine wan derana, li dora gola Wanê hîn tu kurd tune bûne. Welatê Yêrmenîya (Ermeni) bûye. Ew sê bira bûne. Ji wa sê birayana du ji hêla Ermenîyan va hatine kuştin û tenê Miko(Mikaîl) maye. Ew Mikaîlîyên îro, gîştik ji Miko û Lawên wî bûne.

Îro bi tevayî li Hamurê heşt gund, li Taşlıçayê du gund, li Erdişê şeş gund, li Çaldıranê heft gund û li Ankara Polatlıyê şeş gund in. Li navça Ağrı, Wan, Erciş, Çaldıran, Hamur, Tutak û Taşlıçayê jî gelek malên Mikaîlîyan hene, xadan hukum in. Pir kes ji wana jî li her derê Tirkîyê û dunê belaw bûne. Em ê di vir da yek yek qala wan jî bikin.

Di dewra Osmanî û Farisan da ew der wek Bazîd dihat naskirin, gîştik bi Bazîdê va girêdayî bû. Îro Doğu Bayazıt tenê bajarekî girêdayî ye Karaköseyê ye. Dewletê li dû Qetlîama Agirîyê û Zîlanê di Sala 1934an da, Bazîda berê gî xera kiriye û li jêrî bajarî kevn, li hozê navçeyeke nû ava kiriye û gundê Karakilise ku gundekî ermenîya bûye, nav guhartîye û kiriye Karaköse û navenda wîlayeta Ağriyê.

Li gor gotinên Mamoste Kasım jî secera Mikaîlîya heta Mevlana Xalidî Baxdadî tere. Ji bo kesên pê nizanin, dixwazim li vir çend tiştan li ser kesayetîya wî bibêjim.

**MEVLANA XALÎDÎ BEXDADÎ**

Ew kesê ku di nav Kurdan da Neqşîbendîtî belav kiriye. Bi xwe ji eşîra Mikaîlîya ye. Ew Mikaîlîyana li nêzikî Silêmanî, bajarê Qeredax û Helebçeyê dijîn û beşek ji konfederasyona eşîra kurd a CAFê ye. Serokatiya Cafan Mikaîlî dikin. Caf bi tevayî ji 22 eşîran peyda ye û nufusa xwe îro li Îran û Kurdistana Federal qasî yek milyonekî tê texmîn kirin.

Birek ji kurdên ku li Helebçê bi gazên kîmyewî ji hêla Ereban va hatibûn kuştin, Mikaîlî bûne.

Min ew yek îsal di meha 10an da çûm Helebçê û li wir jî pirsî û da tesdiqkirin, serrast kirin. Navî bavî Mevlana Xalid Ehmed e û navî kalî wî jî Îsmaîl e. Navê Mikaîlîyan ji Pîr Mikaîlî Şeşşenguş tê. Li gor Mamoste Kasim Aplaslan, Pîr Mikaîl jî di salên 860an da ji malbata Hz. Osman, bi Fatma Xanimê va dizewice û Mikaîlî gîştik ji wan diwin.

Li Erdîşê-Gundî Payê birêz Heci Osman Axa (81 salî ye) jî iddia dikir ku him Pîr Mikaîl û him jî Xanima wî Fatma Xanim herdu jî ji Mekkeyê hatine. Lê dîsa ji Erdîşê, insanekî zane û dîndar Mela Kemal digot ku Mikaîlî ji Iraqê hatine Kurdistana îro, bi cîh bûne û ji sedî sed kurd in. Ji wana ya ku meri baş dizane ew e; Mevlana Xalîdî Baxdadî ji

www.arsivakurdi.org



Mîkaîlîyên ji payê Behra Wanê

eşîra Mikaîlîya ye. Lê ew Mikaîlîyana bi kurdîya soranî deng dikin û ne Şafîî ne. Nêzîkî şiayîya ne, yan jî Elewîyên kurd in. Mikaîlîyê Wan-Ağrıyê îro Sûnnî-Şafîî ne, Mikaîlîyê Enqerê gî Sûnnî - Hanefî ne û bi kurmanciya devoka Serhedê yan jî Meraşê deng dikin.

Di vir da birêz Fecri ji min pirs kir ku ka em tu îddiaya Seyyîdîyê dikin yan na. Bi rastî me ew nedikir. Lê mezinên me pir dîndar bûn. Ku min kevirê mezelên mezinên me li gund dan xwendinê, (Li vir ji mela Mustafa Çetînkaya re ji bo ew karî baş rêzên xwe carek din pêşkeş dikim) eşkere bû ku li ser hin keviran ew nivîsara heye; *"Mikaîlî Hanedan Kadîminden Mehmetoğlu Seyyit Eyyup Sabri."*

Tarixa mirina wan ji 1840 e. Goristan bi xwe jî ji sala Hicrî 1197 (Miladî 1782) maye û kalî kalî min Heci Osmanî, lawî Usifî Heci Îbrahim dora wê bi dîwarekî çex kiriye. Di sala 1837an da jî ji gund re Mizgeft (camî) daye çekirinê.

Yanî eger ew Seyyit ji wê bê, erê ew delîlek e! Seyyit di erebî da ji kesên ku ji koka Hz. Muhammed in re tê gotin. Lê tenê ne ji wan re. Ji kesên bi qedr û qiymet re jî tê gotin. Li şûna peyva "birêz" a kurdî û „sayın" a tirkî tê bikaranîn. Kurd îro jî li Kurdistanê ji kesên xwenda û rûmetdar re wek rêzdarî diwêjin; "seyda". Padişahê Osmanîya jî

www.arsivakurd.org

dewrekê ew tişt wek paye bi ferman daye hin kesan û piranî daye kurdan. Bi rîya vê ewna mezin kirine û bi xwe va girêdane. Ji ber ku Padîşah bi xwe jî Xelifeyê Îslamê bûn. Yanî Temsilkarê Pêxember Aleyhiselam li ser dunê...

Lê birêz Fecri got ku; "Ji me re jî wekîna diwêjin, lê di destî me da tu tiştekî nivîskî tune ye û em jî di wê iddiaya mezin da nînin."

Devoka kurmancîya me hînekî ji a wana va ji hew cuda bû.

Dibe ku Mikaîlî hatin Serhedê û li wir ketin bin tesîra kurmanciya wan û bawerîya wan. Em jî ji wir hatin Enqerêyê, Anatoliyê û me Mezheba Padişahî Osmanîya hilgirtiye. Ji ber ku Sultanî Osmanîyan Sûnnî-Henefî bûn. Li gor ku mezinên me qal dikirin; kalî kalî min Heci Osmanî Usif (Yusuf, Us) jî li dor salên 1820an da li Istanbûlê di medreseyeke Neqşîbendîyan a girêdayî rîya Mevlana Xalîd bûye, xwendîye û dû re jî ew bawerî bi xwe re anîye, rayî Eşîr û Malbata xwe daye.

Kurmanciya ku em îro deng dikin di bin tesîra kurmanciya canbega û reşîya (Rişvan) da ye û ew jî gîştik ji dorberî Kahta (Kolik), Mereş û Entepê hatine Anatoliyê. Dîsa jî di kurmanciya mikaîlîyên Polatliyê da cûdatîyên mezin jî hene ku ne wek reşî û canbega ne. Eger em deng bikin, meri dikari bizane ku em Mikaîlî ne, ne Reşî yan jî canbeg in.

### ÇÛYINA MIN A ERDÎŞ-WANÊ

Li dû wê hevdîtina me, min biryara xwe da ku di havîna 2008an da herim Erdîş-Wanê. Ji ber ku birazîye min li Erdîşê (Erciş) wek (Endazyar) Muhendis kar dikir û li wir bi Mikaîlîyan va jî têkiliyên baş danî bû. Ez ji Elmanyayê bo tatîla havînê hatim Enqerê û ji wir jî bi rîya firokê çûme Wanê. Birazîyî min Azad, ez ji Firokxanê hilgirtim û em bi Ereba wî pêşta ber bi Gewaş û Extirmanê çûn. Li wir me li ser girava Extirmanê dêra Extirmanê (Kilisa Ermenûya) ya herî kevntir dît, me li hêla gola Wanê masî xwarin, vizika jî em xwarin.

Ez weqas dilşa bûm ku min tu tiştekî negativ, neyênî nedît, tiştê ji bo min a herî muhîm ew bû ku ez Mikaîlîya nas bikim, gundê wana, rabûn û rûniştin xarin, kilam û kurdîya wana, yanî her tiştî wana bi çavî xwe biwînim. Ka em û wana nezikî hev in yan na. Ka em ji wir hatine Anatoliyê, Heymana-Ankarayê yan na. Ew pirsên ku bi deh salan ez jê re li bersivekê digerîyam, di heşi min da tevlihev çerx dibûn.

Li dû ger û xwarinê em çûn Erdîşê, lojmana Azad û li wir raketin. Siwê ji bo xwerînîyê (taştê) em çûn bazara

www.arsivakurdi.org



Mîkaîlîyên ji hêla Agirîyê

Erdîşê. Li Wanê, li Erdîşê xwarina siwê pir bi nav û deng e. Bi hungivî wira, penêrî bi sirmask (otlu peynir), rişkîn û rûnî kal. Me tehm jê derxist.

Çavê min tim li meriyan bûn, ka ew çito bûn, çito deng dikirin?

Li du xwarina me, Azad ji çend Mikaîlîyan re telefon kir. Li dora nîvro birayî hêja Avukat M. Emin Macit û birayî wî Mamoste Ugur hatin. Em bi germahîyeke hemêz kirin. Me jî ew. Te ê bigota me hevûdu ji nêz da nas dikir. Wek du pismamên îro. Lê yê ku koka xwe berî 300 salan da mayî! Bi wana va em pêşta çûn gundî Partaşê (Agaçhan), yan jî gundî malê Elîyî Tausê! Ew nav jî ji bo min û ji bo mikaîlîyan gelek balkêş e. Gund qasî 15 km ji navça Erdîşê dûr bû. Li ber gund dewletê bendavek çêkiriye. Di nav dar û baxça da malan xanî nedikirin. Me li berî gund çend resim kişandin. Gundê berê di bin bendavê da maye. Birayî M. Emîn em bi çend meriyên xwe va dan nasandin, wek Cahit û Mixtarî gund apî wî va. Wan jî bi çavên, nerînên bi meraq, bi matmayî li me dinêrîn.

Merikî 50 salî ji Enqerê, ji Elmanya rabûye, hatiye û iddia dike ku ew jî mikaîlî ye, kal û pîrî wî jî berî 250 salî ji vir, ji Kurdistanê bar kirine çûne Enqerê. Ji ber çi çûne wê jî nizanin! Piranîya wana şaş û metal li me dinêrîn lê pê hez jî dibûn.



www.arsivakurdi.org

Du re wana ji min re qal kirin, gotin ku ew dera Geliya Zîlanê ye. Ew geliya ku di sala 1929an da berî komkujîya Agiriyê, tenê ji bo çavtirsandina kurdan dewletê têde qasî 15000-40000 insanên bêguneh, zar û zec bi hovane, barbarî qir kirine! Ew Gelîya Zila an jî ZÎLAN!...

Gundî mikaîlîyan gîşt li dora bendavê û di geliyê Zîla da bûn. Wê ez hîn jî tiji kirim. Ku ez li wir digeriyam, dilê min kelkelî bû, yekî tiştek ji min re bigota ez ê bigîryama. Ew miletî min î bêxadî û mazlûm. Ji ber destî zalima qe çi nekişandîye û hîn jî dikşîne. Lê gelo ew ê heta kînga here? Ew ê rokê bi dawî neyê?

Qasî ku ji destî min dihat, min ji wan di derheqa Secera wan, erf edet û rûsimên wan da tişt jê dipirsîn.

Di komkujiya Zîlanê da ji mikaîlîyan jî insan hatine qetilkirin, qir kirin. Lê hîn kes jî bi hîkmeta Xwadê jê xilas bûne. Ji min re qala mesela Xaltiya Xezal kirin. Eskerê Tirkan insan gî li derekê berhev kirine, kom kirine û di serhev da kuştine, hinek di goman da bi zîndî şewitandine. Xaltîya Xezal di bin miriyan da maye û li dû qetlîamê du birayî xwe û bi xwe ji wir xelas kirine, revîyane. Min xwest ez destî wê paç kim. Lê ji ber ku ew dîndar bû, destê xwe neda min.

Li dû hevdîtina me bi M. Emin va, birazîyî min ez bi birayî Cemal Macit û Ali Macît va dan nasandin. Min behsa wana hîn berê da bîhistî bû. Ji Agiriyê Ayhan Yılmaz ji min re qala wan dikir. Ez dikarim biwêjim. Ew hurmeta, mîvandarîya ku kek Cemal ji me re kir, bira ji birayî xwe re nake. Wî em tu deqekê tenê bernedan. Bi ereba xwe em li Erdîşê, Çaldiranê û heta Agiriyê gerandin. Me çiqas li berxwe da jî feyde nekir. Ez bi vê hîn jî pir mehçûb im.

Wî em yek bi yek li wan derana bi mikaîlîyan va da nasandin, di rê da jî ji me re qala meritiya li nav mikaîlîyan dikir.

Min dît ku pir tiştê ku ew qalê dike, bi ya birêz Fecri va hevûdu digrê, wek hev in. Ya herî muhîm jî, min dît ku mikaîlî li vir gî meri û xisim in. Gî ji bavikî hatine. Secere gî tên di bavekî da digihêjin hevûdu. Yanî eger em jî ji wan mikaîlîyana ne, em jî berî 300 salî pismame wan bûn. Nîşana wê jî di secera da hebûn. Navî kala bi pirani hevûdu digirtin. Karakterên mikaîlîyan, kultura wan da tiştên wek hev zêde bûn. Lê min li jor jî qala wê kiribû, devok û bawerî çîçikî hatibû guherandinê.

**Gundi mikaîlîyan li Erdîşê ev in:**

1- Payê (Pay):Texte Pay(Payitaxt) jî diwêjin, Ji ber ku begî wana wextekê

www.arsivakurdi.org

begtîya Ademîyan kiriye, 400 mal in. Mala Çelika mezinê wan ne.

2- Çağırbeg (Karakilise): Sedî pênce mikaîlî ne. Ji mala Efdî Axa, Mala Usifî Heso mezinê wan in, Mixtarî wana Mihemedi Beşîr Axa mikaîlî ye. Secera wan wekîna tere Kasim- Usif- Heso- Efdî Axa.

3- Îşbaşı: Gî mikaîlî ne. Digêje Partaşê.

4-Partaş (Agaçhan) Pêşîyê mikaîlîyan ew in. Gundê mala Elîyî Tausê jî diwêjin. Kek Cemal Macit, Ali Macit û Avukat M. Emin Macit ji wir in.

5- Mamadel (Imam Abdal): Gundê herî xweşiktir ya mikaîlîyan li Erdîşê ew bû ye. Wext nebû em biçiyana wir.

6- Mezre.

Mezinê mikaîliyan li Erdîşê evana bûne;

Mîrliva Mihemed Efdî Axa
Elîyî Tausê
Heci Usman Axa (Osman)
Reşit Axa
Şewêş Axa

**Qeymaqamî Erdîşê Selman Beg**

Ji gundî Partaşê mala Tausê bi xûşka Simko va zewicîne, Elîyî Tausê xarzîyê Simko Axayî Îsmaîlî ye. Yanî bi kurdên Îranê va jî didin û distînin. Li vir meri dikare qala mesela kuştina Elîyî Tausê jî bike. Ew di dema Osmanîya da tehsîldar bûye. Bi pismamên xwe, Mala Keko va navbera wan xeraw diwe û di pevçûnekê da tê kuştin. Li ser vê meselê Mala Keko bar dikin terin li Hamur - Karakose bi cîh diwin.

Ji vê jî meri berda teri ku mikaîlî pêşta li alîyî Erdîş(Erciş) û Bazîdaxa (Çaldıran) bi cîh bûne û dû re ji vir jî çûne Hamur û Tûtaxê. Lê li gor gotina wan, ew 300 sal berî vê ji Îranê hatine Bazîdê.

Li gor min mikaîlîyên Anatoliyê, Enqerê ji wê wextê da bi wana va rîya xwe qetandine û berve roava hatine. Dibe ku ew rê ji ser Ruha (Urfa), Kahta û çola Qonyê be.

Li hêla Gola Wanê min ji gundî Payê birêz Ubeyd û Zubeyd naskirin û navê govend û kilamên govendan ji wan pirskirin. Ji bo ku em binêrin ka ê wana û ê me va hevdu digrin yan na. Wana ew ji min re rêz kirin û birayî Zubeyd jî em neşikandin û ji me re kilama Hesiko Weli Welî strand. Di şora kilamê da hin tişt ji hev cûda bûn. Lê melodî ji sedî sed wek hev bû.

**Navên govendan ev in:**

Giranî
Dolawê
Hesiko Welî
Narê

www.arsivakurdi.org


Mîkaîlîyên Çaldiranê

Koçerê
Laçîn
Papûrê

Ji vana xeynî Xencî Laçîn û Papûrê ên din wek ên me ne.

Ji wir jî em roya din bi birayî Kek Cemal va çûn Bazidaxayê (Çaldiran).

**BAZIDAXA (ÇALDIRAN)**

Bazîdaxa navê wê ya kurdî ye. Di navçê da mikaîlî, şemsikî û şêxkî hene. Bajarekî bi qasî 15000 welatîya ye. Serokbajarî Bazîdaxa î dewra berê ji Mikaîlîya birêz Faruk bûye, merivekî gelek zane û camêr e, înşallah ew ê dîsa bê hilbijartin.

Kekê Cemal em birin dukana apî Selahaddin Saxlik. Însanekî dilpak û comerd. Dukan li ser rîya herî mezin a Bazîdaxayê ye. Li wir hacetê malan difroşe. Gavek kin da qasî 15 mikaîlîyê din jî hatin dukanê li dor me rûniştin. Min yek yek li wana dinêrî, wana jî li min û birazîyî min. Ku wana bihîstin, birazîyî min Azad serokê Karayollariyê ye, elaqayek zêde rayî wî dan.

Kek Cemal em dan nasandin û qala sebeba hatina me kir. Dû re em ketin nava sohbetê. Yek ji mezinê wan Ape Mistefa Demir, 82 salî bû. Gîştika guh didan wî, gotina wî. Însanekî xoşsohbet û henekçi bû. Yaranîyên bi aqil dikirin.

Wek karakter te yê bigota ew ji bera me ye, Hecî Îbrahîmî ye. Wana em berra nedan, gavek şûn va em gî tevûhev rabûn çûn mala apî Selahaddin. Malek li taxa Çaldiranê, malike mezin.

Ji me re pezek serjêkiribûn, xarin amade kiribûn. Wek edeta kurdan me li erdê nan xar. Min li wir jî carek din mîvandarîya kurdan, bi taybetî jî ya mikaîlîyan dît. Wana em tu ji berêda nasnedikirin lê ji bo me pezek serjêkiribûn û ew kesên li dor me bûn, gîştik dawet kiribûn.

Ew mîvandarîya ku gerokî Fransî George Perrot di sala 1861an da li nav mikaîlîyên Enqerê da dîtiye û ew di kitêba xwe da jî pesandiye! Gelo ka tu miletekî din wekîna destfere û comerd heye?

Me ji Apî Mistefa jî secera wana pirs kir. Bi alîkarîya yên din jî em gelek tişt hîn bûn.

Li gor gotinên wana; Ademî berê du birrên mezin bûne. Yek Mikoyî (Mikaîlî), yek jî Ecoyî. Seroke Ademî (Adaman) ya ji Mikaîlîyê Efdî Axa bûye. Keça wî Heno Xatunê jî serokatiya eşîrê kiriye û li Çakirbegê rûniştiye. Qeymaqamê Erdişê di sala 1890an da lawê Heno Xatunê Selman Beg bûye. Ji malbata wan Ahmedê Mihemed li Zîlanê ji hêla dewletê va hatiye kuştin.

Torinê wana hatine li Bazidaxayê bi cîh bûne û paşnavê wan jî Paçal in. (Paçal ji "Bac almak" tê). Dayîn û standina wana bi kurdên Îranê va ji berê da hebûne. Piranî jî bi Emoxans -Xoyê va.

Dîsa li Makuyê, gundî Qerenî û Sêpira mala Reşîdî Ûsif Axa ji Bazîdaxayê çûne wê derê.

Wek anekdotekê li vir meri dikare qala van tiştên li jêr jî bike.

Mikaîlî di dewra serokatiya Ademîyan Efdî Axa da bi serokî Heyderan va, ji torinîya Kor Huseyîn Paşa va tim diketine hev. Ji mala Kor Huseyîn Paşa re mala Şêro jî diwêjin. Îro paşnavî wana Erhan, Suphandagli û Gormez in.

Îro seroktîya Ademîyan derbasî eşîra Şemsikîya bûye.

Mikaîlîyan pir bi Toriniya îna nakin. Li gor rîwayetekê, wana mezinê Mikaîlîya Mihemed Axa li Erzinganê ji bo paşabûyînê bi jehrê dane kuştinê.

Wekî tê zanîn, Kor Hûseyîn Paşa pêşta li hember serhildana Şêx Saîd sekiniye û li dij şer kiriyê, lê li qederê binêrin, çend sal li dû wê bi xwe di şerê Girî Daxê (Agrı Dağı Başkaldırısı) da li dijî dewletê û ji bo Kurdistaneke azad şer kiriye. Neviyê wî Cemil Erhan jî di dewrekê da Bakan bû. Îro li Anatoliyê piranî jî li Gundê Konya - Kulu û Cihanbeyliyê malên Torinîya hene.



www.arsivakurdi.org

**Li gor gotinê Apî Mistefa û yên din, Malê mezin ê mikaîlîyan ev in.**

1-Mala Osmanî Şewêş
(ji Mala Feqî Mîrze)
2-Mala Tausê
3-Mala Efdî Axa
4-Mala Şewêş
5-Mala Uzman (Osman) Axa
6-Mala Brahîm Axa
7-Mala Temî Miko

Şewêş Axa û Efdî Axa jî pismamê hevî heq in.

**Gundên mikaîlîyan li Bazîdaxayê:**

1- Xan Koy, ew bera bi mala Keko (Hamur-Alpaslan) va meriye hev in, digîhije wan. Mezinê wana Mala Heci Bekir û Mala Heci Mihemed in.

2- Pira Efdî (Yaşkûtûk)

3- Tirşik (Demircik), ew digîhijin mala Tausê.

4- Bîşî (Xweni Koy) = Erginler

5- Haci Ziyaret (Yatirli)

6- Şerefxanê jêrî (Aşagi Mutlu)

7- Nanparêz (Kuzgunkiran)

**Mikaîlîyên girêdayîyên navça Wanê li van gundana rûdinin:**

1-Ayanis (Alakoy)
2-Sari Mehmed Koyu

**Govendên mikaîlîyên Bazîdaxêyê ev in:**

1-Temiraxa
2-Qurskî
3-Romanî
4-Hesiko Welî
5-Dolawê
6-Koçerî
7-Narê

Ji wan jî xencî Romanî, Qurskî û Koçerî yên din li cem me hene.

**Çend edetên mikaîlîyên Bazîdaxayê ev in:**

Di dawata da bebercîye bûkê re diwêjin Lîstika Rûvî. Ew Rûvi hewce ye bi dizika di mala bûkê keve. Gere ew camêr û çînzane be. Eger ew hat girtin, ezîyetên û heqaretên mezin pê tê kirin. Bi tekera gaxniyê va tê girêdan û ji jor da tê tol kirin.

Cirit li vir jî heye, berê li ba me jî hebûye. Lê nika li cem me ne hesp maye, ne cirîd!

Suwarî li dawata rastê hev tên, ji hev kumekî ji serî direvînin. Ku yek kumî xwe ji serî bide revandin, ew heqaretek mezin e.

Henekek wana ji Apî Mustafa Demir;

Mela kirine govendê, mela ji Xwadê re gotiye "Xwadê, tu min ef ke, Tu guneh nenivisine!

www.arsivakurdi.org


Mîkaîlîyên Partaşê

Mela epey govend cerx kiriye. Dû re gotine "Mela tu govendê dikşînî, tu ê stranekê jî bistirê!" Mela bi dengî defzirnê û kişandina govendê ji xwe derbas bûye, hatiye eşqê û gotiye; Xwadêyo tu guneh dinîvîsîne jî tu dizanî, tu guneh nenîvîsînî jî tu dizanî! Û dest bi kilamên govendê jî kiriye.

**AGRI / DÎROKA BAZÎDÊ**

Ji ber ku pir tişt bi tarîxa Bazîdê va girêdayî ye, em li vir qut qala dîroka Bazîdê jî bikin. Îhtimalek mezin bi hatina mikaîlîyan va jî girêdayî ye.

Di 1514 da ew derana ji destî îranîyan dikeve destî osmanîyan. Di sala 1590an da ji alî Ferqînê bi Qara Behlûl Paşayî Sîlvanî va Eşîrên Bisiya, Sipkîya û Zîlan tên dor berî Bazîdê şên dikin, (Pisiya îro li Kirşehirê hene, Sipkî û Zîl hîn jî li wan derana ne, piranîya Zîla di sala 1929an da ji alîyî dewletê da hatine qirkirin.) Ji ber ku ew derana ji ber şerê Îran, osmanî û rusan vala bûye. Gund nemane.

Ji wê şûn va heta 1744an bi rîya Ocaxlixê ew sancax ji hêla wê malbatê va tê îdarekirin. Di 1744 an da Şahî Îranî Şah Abbas êrîşî ser Bazîdê dike û bi tevayî wê sancaxê ji hevda dixî. Li dû wana jî Xanedana Îshak Paşa diwe hukumdarî wê derê.

Diwe ku Mikaîlî û piranîya Kurmancên Serhedê ji wan dewrana

hatine wê derê û ji wir jî belaw bûne, çûne derên din. Tarîxa koçê, barkirinê hevudu digre.

Li Tahrir Defterîya Bazîdê di dewra Sultan Murad III da wek sancax wekîna bûye:

1. Beyazid
2. Diyadîn
3. Eleşgîr
4. Şelwe (Hamur û Tutak)

1887 di Salnameya Erzurumê da Beyazid Sancagi:

1. Merkez (Beyazid)
2. Antap (Tutak û Patnos jî wek bucak girêdayî vira bûye)
3. Karakilise (Karaköse)
4. Diyadin
5. Eleşgîrt

Meriv li vir diwîne ku cîhê ku Mikaîlî lê jiyane wek Hamur û Tutak bi navî Şelwe û Antap hatiye binavkirin. Ew jî balkêş e. Gelo ew jî ne Antep (Gazî Antep) a îro be?

Lê navî Şelwe ji ku tê û çû ye ku?

**TIRBA EHMEDÎ XANÊ**

Ji Bazîdaxa jî dîsa bi kek Cemal va em ketin rê û ber bi Agirî û Bazîdê çûn. Li ser rîya me û di programa me da pêşta serlêdana Tirba bavî kurdayetîyê, fîlozofî nemir Ehmedî Xanî hebû.

Qasî sê saetan şûn va em gihîştin Doğu Bayazîda îro. Bajar bi xwe li bintaxa çîyayî Agirîyê ye. Li ser hozekê ava bûye. Heta 1934an Bazîd bi sedsalan wek navendeke mezin û bi deng bûye. Lê li dû serhildana Agirîyê dewletê bajar, yê ku li ser çîyê, li dorî qesra Îshak Paşa bûye, bi erdê va kiriye yek, gî şewitandîye û li şûna wê, li jêr bi navî Doğu Beyazitê bajarokekî nû ava kiriye. Ji ber ku Bazîdê ji serhildana Agirî re navendîtî dikiriye. Pişta serhildanê girtiye. Serbajarî jî hilgirtine birine Karaköseyê.

Lê ew ruhiyata ku Ehmedî Xanî dixwastîye di nav kurdan da hewe, hîn jî li va derana gelek xwurt dijî. Bazîda îro dîsa bûye navendek bi her awayî, kurdî. Serokê bajêr jineka kurd e ji partîya kurdan a DTPê ye.

Em ji nav bajêr da derbas bûn û me berê xwe da palê û me da ser rîya Qesra Îshak Paşa. Ew li ser çîyê wek bazekî kon bûbû. Bazekî nobedarê mîrata Ehmedî Xanî. Nobedarê mîrata Îshak Paşayî Kurd. Rê me dida ku em herin gora wî, herin li wir ruhîyata xwe ya kurdîtîyî teze bikin û xwert bikin.

Li paş wan jî ji wana mezintir wek yêzdanekî, çîyayî Agirîyê çûk û a mezin!... Û di teyba Kek Cemal da Heme Hecî kilama Dewrêşî Evdî distira. Min welatê kal û bavan, welatê hezar salan



www.arsivakurdi.org

nika didît, bîhn dikir û dibihîst. Herçik em bi erebê derdiketin jor, heşê min hîn jî li ser min diçûn, ez pê sermest dibûm.

Rîya tirba Ehmedî Xanê û a qesra Îshak Paşa di nav garnizonên eskerîyê da derbas dibûn. Min li wir carek din bi çavî xwe dît ku eskerî tirkan xwe wek mîvan diwîne. Ne xadîye wir û bi tirs e!!! Li ser her holikek nobedaran sê esker hebûn. Ku te lê dinerî, dor paşî Bazîdê bi tevayî ji hêla wan va hatibû pêçandin. Lê ew yeka tu xema kesî nebû. Kes ji wan neditirsiya!

Li dû 15 deqa em gîhiştin qesrê. Meriv nikare wê tasvir bike, tenê ji wir carek din dîtina Bazîdê û çîyayî Agîrîyê bedela dunê ye.

Ew qesr di sê nesla da ava bûye. Li dor paşî wê meriv xirawên kevn yên Bazîdê nas dike. Sê mizgeft hîn li pê ne. Yek ji wan jî tirba Ehmedê Xanî û mizgefta wî ye. Em çûn wir jî. Ew der wek mehşerê ye. Ji her derê kurd hatine û seri li bavî kurdayetîyê, filozofî kurdan dixîne, rêz û hurmeta xwe re wî didin. Hinek memurên tirkan jî hebûn.

Me avdesta xwe girt û li ber gorna wî, tirba wî di zikî xweda bi zimanî ku wî pir qedr û qiymet didayê ji wî re dua xwendin. Ji ber ku wî hîn di 16/17 sedsalan da dizanî ku Xwadê ji her zimanî fehm dike û kurdî jî yek ji wan zimanan e. Ji ber wê jî bi zimanî me yî qedîm ji me re û zarokên me re Nûbihara biçûkan nivîsandîye.

Li vir ez dikarim çend tiştên ku bala min kişandin jî ji xwendevanan, mezin û rêberên kurdan re binîvîsinim. Li gor min ewna gelek muhîm in. Berî her tiştî jî bajarvanîya Bazîdê hewce ye li ser wê bisekine, giranîyê bide wê.

A yekê ew bû ku tu li derekê behsa kurdîtîya wî nedihat kirin. Ew kîtabe yan jî nivîsên ku wek Tabela li ser tirba wî bûn, gelek jê bêmane bûn.


Ya duduya jî li hundir û derva li ser tabelayên gelek mezin secera malbata Arvasîya hebû. Gelo min ew jî fehm nekir. Wana xwe ji 99 bavan heta Hz. (S.A.V) Adem dibirin. Baş e eger Mala Arvasîya bi îspat wê dizanin yan jî bi wê bawer in, dikarin binîvîsinin.

Lê ne li ser tirba Ehmedê Xanî û ne bi wê mezintiyê. Ewna dikarin secera xwe di goristana xwe ya taybet da dardakin. Lê em dizanin li cem Xwadêyî mezin ew jî guneh e. Ew tişt him ji bo malbata Arvasî eyb e, him ji bo kurdan.

Ew sîyê dixîne ser kesayetîya Ehmedî Xanî. Lazim e ew bêt guhertinê.

Li gor min hewce ye ew der bi alîkarîya dîrokzanên kurd careke din bê bicîhkirin. Bi konseptek hîn nû. Ji boyî kesên ku serî li wir xe, bila ji wir

www.arsivakurdi.org



Dr.Mîkaîlî li ser tirba Ehmedê Xanî

bîhna fikra û ruhîyeta Ehmedê Xanî hilgire û bizivire.

Tiştekî din ku min dît, hinek malbatan mezinên xwe, kal û bavê xwe li hewşa tirba wî da dabûn erdê. Baş e ez wan jî gelek rind fehm dikim. Lê gerek wê jî çend prensîbên xwe yê kurdî hewin.

Wekî din dîsa jî li cem wî bûyîn huzurekê, kêfekê dide meriya. Ez ji her kurdekî re çûyîna vir tevsiye dikim. Bi vê meri ji welatî xwe hîn zêdetir hez dike.

Ji ber ku wexta me kêm, programa gera me jî tijî bû, em mecbûr man û dîsa di rê kevin. Tabiatek xweşik, eyamekî nerm û sivik hebû. Her der hêşin bû.

Qasî demekê em gîhiştin Agiriyê. Kek Cemal em birin dukanên Yilmaz, ên xal û pismamên wî, xisimên wî.

Di navbera mikaîlîyên Erdîş û

Agiriyê da bi rîya zewacê hîn merivantî berdewam e. Mala Elîyî Tausê bi mala Temî Miko (Gundî Tanaqiran) va keç dane hev. Dîsa Çelik ji Payê-Erdîşê bi Alpaslanan va bi rîya xisimtiyê hîn vê merivantiyê dewam dikin. Wek yaranî li çend deran ji me ra jî gotin. "Eger hûn dixwazin merivantiya xwe, bi mikaîlîyên vir va dewam kin, hewce ye em keçan bidin hev."

Ew çiqas gotineke rast e! Le xortê vê dewrê bi guhra me nakin. Ew li gor dilî xwe dizewcin, yan jî tu nazewicin jî. Ez wek kes bi vê pir diêşim.

Mikaîlîyên li Karakose mala Yilmaz û Alpaslan a di nav bajêr da gelek xadî îmkan in. Bi karî danûstandinê va mijûl in. Biserketî ne.

Ji ber ku em mecbûr bûn wê şevê dîsa bizivirin Wanê, me hema di dukanê da dest bi lêpirsinê kir, dû re wan xwestin em herin buroyeke wan.

Em çûn wir. Buro jî di îşxanî ya mala Alpaslanan da bû. Xortekî Yilmaz Ayhan, jêhatî û hêja, Bavê wî mamoste, mixtarê Tanaqiranê û hîn ji mala Yilmaz çend kesên din hebûn. Min di derheqa mikaîlîyên Agiriyê da pirsî, wan bersiv dan.

Wana em bernedan û birin xwarinê. Lê min pir dixwast ez herim gundekî wana jî biwînîm. Inşallah Xwadê wê jî ji min re bike qismet.

Li gor gotinên mezinên mikaîlîyên Agiriyê mikaîlî gîştik ji van sê kalan bûne:

1-Mala Temiri Miko

2-Mala Mihemed

3-Mala Osman Axa

**Gundê mikaîlîyên Agriyê ev in:**

TAŞLIÇAY

1- Extiyar (Alakoç), mezinê wan Reşît Axa (Çakmak) bûye. Nika mala Haci Abdullah, Halil Çakmak û Haci Tahir Çakmak e.

2- Delavê Qîre (Akyildiz)

Ji bera malê Bekir Axa ye. Mala Akyildiz û Haci Fewzî Goksun e.

HAMUR

**1- Taneqiran (Danakiran):**

Ji sedî sed gî mikaîlî ne. Ji ber ku ji berê da ji derva keç nehanîne û keç jî nedane. Malên mezin, Mala Haci Mehmet Salih Yilmaz e. Ji bera Temir Paşa ye. Temir Paşa di dewra seferberlixê da surgunî Rihayê bûye. Wî çardeh lawên xwe hebûne. Ji ber ku ew gelek bi qewet bûye, îdara wê derê, belavkirina genim, zahire didin wî. Ew li gundî Qilît-Urfayê bi cî bûye (dibe ku îro ew gundî Qilîtê yê Merdînê jî be). pênc ji lawên wî dû ra li Muş-Bulanik -Xarabeşehîr (Navi Îro Orenkent) bi cîh bûne.

www.arsivakurdi.org

**Navê zaroyê Temir Paşa (Temirê Miko) ev in:**

1-Cemşîd Axa
2-Yunis Axa
3-Îbrahim
4-Ali
5-Tahir
6-Reşit
7-Ahmet
8-Mahmut
9-Mustafa
10-Abdulhamit (Rehmeti)
11-Mehmet (Rehmeti)
12-Kudret Xatûn
13-Fatma Xatûn

**2- Xanemer:** Mala Zubeyd Gîrgîn
3- Qandil Dax (Şêxtokil):
Mala Îbrahim Alpaslan
4- Demirkapi (Karavun):
Mala Mehmet Alpaslan
5- Karaseyithanli: Mala Reşît Axa, lawê wî Mehmet Çelik
6- Xano (Karabulak):
Mala Mela Kemal, bera Mustafa Axa ye
7- Seyitxan Beg: Bera Şûkrî Beg e.
Mala M. Ali Alpaslan

**Mezra Akyurt (Goma Dudera):**

Mezra Seyitxan Beg e. Mezinê wana berê bave H. Fecri Alpaslan, Ehmed Axa bûye (H.F.A. Sê cara di parlamentoyê da miletvekilî kiriye), Ehmed Axa jî dewrekê di parlamentoya Tirkîyê da Miletvekiltî kiriye.

8- Gelutan (Kaçmaz):

Govendê wan ev in;
1-Sêling
2-Şêxanî
3-Dolawê
4-Hesiko Welî welî
5-Narê
6-Delîlo
7-Xezalê
8-Lingeling
9-Laçîn
10 Papûrê

Ji vana Laçîn, Papûrê û Şêxanî yê bêtir, yên din gîştik li cem mikaîlîyên Enqerê jî tên lîstin, kişandin. Dibe ku ew Papûrê û Laçîn ji kurdên alîyî Serhedê li du hatina xwe ya vir girtine, hîn bûne! Ji ber ku civak ji hev jî pir tişta digrin û didin jî.

Çend navê xarinên mikaîlîyên Wan-Agriyê ev in;
1-Hevrîşk
2-Qelîsêl
3-Helîse
4-Keşke
5-Sengesîr
6-Avdan (Şivankî)
7-Avsîra Toraqê
8-Yaware serme
9-Keledoş



www.arsivakurdi.org

10-Xaşil
11-Kuftefirk
12-Girara dêw
13-Girara sibê
14-Xaşila qartola
15-Naziknan
16-Bişî
17-Kade
18-Mirtoxe
19-Helaw
20-Jajenûr
21-Zad

Kiloçe nave nanekî ye, qaling e. Li Îdîrê (Igdir) ji kiloçe ra kilor diwêjin. Ew bi ya me hevûdu digre, wek hev e. Navî nên yên din ev in:

1-Nane refikê
2-Nane tirş
3-Nane hişkeva
4-Rişte
5-Berzawar

Merî li vir dibîne ku aşxana, mitbaxa kurdên mikaîlîyên vê derê pir dewletî ye, fere ye. Ji vana kêm nav li cem me hene.

Lê navê du çîn nan li cem me jî hîn hene, Ew jî nanê hişkava û nanê tirş e. Nanê tirş ji bo hema xarinê tê çêkirinê, nanî hişkeva jî ji boyî zivistanê heta sê mehan tê pêtandinê. Li zivistanê herçik hewce bû, wê gavê derdixin, şil dikin û dixwin.

Ji wan xarinan tenê navê helise, hevrîşk û keşkeyê li cem mikaîlîyên Enqerê hene.

**BAWERÎYA MIKAÎLÎYA**

Ji ber ku navî Elîyî Tausê navekî kurdên ku dînî xwe Êzdahî (Yezidilik) ye pîroz e, min ji çend kesan ew nava pirs kir. Li gor wana hin kes ji mikaîlîyan re, yan jî ji mezinên mikaîlîyan re dibêjin File an jî Êzdî. Lê îro mikaîlî wek insanên dîndar, mısulman tên naskirin. Hinek koka xwe heta Mekkê, Hz Osman jî diwin. Ew tiştekî niqaşê ye. Ji ber ku piranîya kurdan li hêla Serhedê berê êzîdî bûne, dibe ku ew rast be. Di nav Mikaîlîyên Anatoliyê de jî pir tîşt hene, hîn îro jî di nav êzdîyan da wek dînî, olî tên kirin, wek pîroz tên qebul kirin.

Wekî Ar (Agir) pîroz e, nayê vemirandin, li ser êr av nayê rijandin û li ser da nayê mîz kirin. Li şev serî kuliga gerek meri pêlê neke. Cin ê li meriya xîn. Por-pirç nayê avêtin, dikin qulê dîwaran.

Di zaroktîya me de em bi lîstikekê dilîstin. Navî xwe çember bû. Ku me dora zarokekî çember çêkir, heta ku me bi xwe ew pa nekira, wî nedikarî jê derkeve. Dara zîyaretê, moriya çavê, malê ocax hebûn. Ew edet û rûsimana hîn jî di nav kurdên êzîdî da hene. Kinc û cilên jinan jî wek yê êzdîyan e. Şar, kitana spî, xeftan û pêşgîr e.

www.arsivakurdi.org

Me li jor jî qalê kir; mikaîlî li Agrî û Wan ê sûnni-şafî ne, li Enqerê sûnnî-hanefî ne, li Kurdistana Iraqê (Îro Kurdistana Federal) jî soran û piranîya wan jî Ehl î Heq in. Lê em dizanin hundirî sedsalan de him ziman û him jî bawerîya dînî dibe ku bê guhertinê.

**KARAKTERÊN KESAYETÎYA MIKAÎLÎYA ÊN BALKÊŞ**

Min li herderê ji mikaîlîyan pirs kir ka ew bi çi û çito tên nas kirin. Wan ev karakterana ji min re hjmartin;

1-Dîndar in, lê di dîn da şan û şuretê (gosterîş) hez nakin
2-Tim serokatîyê dikin
3-Ji bo tiştî nû ne
4-Idare dikin
5-Comerd in, hêbûna xwe bi kesî din va jî parve dikin.
6-Xêrê û rindî kirinê hez dikin.
7-Serî xwe stûyî xwe li ber kesî xar nakin.
8-Mezintiyê dikin
9-Tîcaretê baş nikarin
10-Xwendinê hez dikin
11-Xwarinê hez dikin
12-Zulûmkar nînin
13-Kenînê hez dikin
14-Kêfçî, henekçî û qerfçî ne
15-Mikaîlî dirêj najîn, zû dimirin.

**MIKAÎLÎYÊN LI DERÛDORÊN DIN**

Li Adapazarı, Guneşler mahallesi 50-60 mal ji Partaşê ji bera Şewêş Axa.

Denizli-Saraykoy-Ikici Koyu, ji mala Tausê 30 mal ji Xaçîna çûne wir.

Aydin Soke-Ortaklarê 30 mal ji mala Temirê Miko.

Mikaîlîyê Polatli û Enqerê ji şeş gund in. Îro bi hesabekî gilover meri dikare qala 10000 kesî bike. Pir kes ji wana li Bursa, Istanbul û Aydin-Soke-Ortaklarê bi cîh bûne.

Wekî din jî yeko yek li dera malên mikaîlîya hene. Wek mînak ji Urfa-Vîranşehîr yan jî Bozovayê, mala Haci Arif Dodanlî gotine em mikaîlî ne. Zaro û neviyê wî îro piranî li Istenbolê ne. Dr Necati Dodanli yek ji wana ye. Dîsa li Bitlisê Ûmit Dodanlî jî ji mala wî ye. Heci Arif Dodanli tucar bûye û gund bi gund li va derana tişt difirotîye. Ji ber wê jî ji Wanê bigrê heta Agriyê mikaîlî gîştik wî nas dikin. Dukanek wî bi navê Dodanli Ticaret li Enqerê -Hergele Meydanî jî hebûye.

Lê gelo ew mikaîlî ye yan na, ez bi wê baş nizanim. Gerek meriv bi zarok û neviyê wî va deng ke.

Li Heymanê Mela Qadir ji Tutaxê ye,

Mala Kepoglu ji Hesenkêfê Şêxdodi ne, lê ji hêla dayikê da mikaîlî ne.

Li Burhaniyê ji mala Heci Osman Axa Haci Abdullatif û zarokên wî Hakki Gûnonû hene.

www.arsivakurdi.org

Ji Mûş Haskoyê mala Sado Axa jî bidirî ne, lê dawa mikaîlîtîyê dikin. Hînek diwêjin ew lawê Temir Paşa ne. Îro mezinê wan Alican Axa (Er)ye.

Li Bingol-Karliovayê çênd mal hene.

Birêz Hasan Fecri Alpaslan bi zarokên xwe va li navça Enqerê bi cîh bûne.

Li Bursa û Karacabeyê ji bera Keko, Mala Heci Feridun Alpaslan heye.

Li Licê-Diyarbekirê Ahmed Axa heye. Li Konya-Cihanbeyliyê Muzaffer, Haci, Durdu Menteş hene, polîs bûne, Nika mala xwe barî Adanê kirine.

Dîsa li Konya -Kuluyê mala Ahmet Dîkbaş ji mala Keko qetiyane û berî 60-70 salî li Qulekê bi cîh bûne. Zarokên xwe îro li Ewrupê dimînin.

Li seranserî Ewrupa jî qasî 100 kesî mîkaîlîyên ji her derê dijîn.

Bi vê nivîsa li ser gera xwe min xwest ez him informasyonê xwe, him jî netîca gero ku li du koka xwe, bingeha xwe bi xwendevanên Birnebûnê va parve kim. Li gor min ev lêkolîn û ger hate dawiyê.

Ez dikarim biwêjim ku em ji bingehê da ji mikaîlîyên Wan û Agriyê qetiyane. Di qasî 30-50 salî da li derên cudayê Anatoliyê geriyane û di dawiyê da jî li ser Fermana (Haymanateyn Fermani 1804) Padişahî Osmanîya jî li gundî Mikaîla û dorberê bi cîh bûne. Ji gund mal gî mikaîlî nînin. Bi texmîna min sê berê mezin mikaîlî ne. Le yê din pê li hev ji Kurdistanê hatine û li wir mane bi mikaîlîya va jî zewicîne û ji gundî Mikaîlîya bûne.

Hatina mikaîlîya ya herî sade û ez jî pê bawer im, birêz Mela Kemal ji min re got, ku ew yeka bi ya birêz Fecri, birêz Heci Osman Axa û birêz Ali û Cemal Macit va jî hevûdu digrin, wek hev in. Ew wekîna bûye;

Ji Kurdistana Iraq-Îranê hatine Bazîdaxayê (Çaldiran), dû re Erdîş û dû re jî Hamurê. Ê me di kîjan merhalê da ji wan qetiyane em wê pir baş nizanin. Lê mezinê me digotin ewna bi bira û pismamê xwe va ji hev sû hatine û ji ber wê welat terikandine!

Ev cudatîya zar û zimên, cudatîya olî û bawerîya olî di navbera mikaîlîyên Enqere û ê Agri-Wanê jî tişt hene. Di hundirî 300 salî da pir tişt tên guhertinê. Ew 300 sal, ji zaroktiya min da bihesiwînin neh bav in.

Ez ê li vir hinek secereyên mikaîlîyên Wan û Agriyê jî biweşînim. Ji bo ku kesî dixwaze bira wana bide ber hev.

Ji bo mala me, bera me Heci Ibrahima ez dikarim biwêjim ku hinek navên kalên me û yê mikaîlîyên Erdîşê, bi taybetî jî ya Payê bi mala Çelika va hevûdu digrin. Dîsa bi navên malbata Alpasana va jî gelek navên wek hev hene.

Ev ne tesaduf e. Ji ber ku kurdan berê tim navê bav, kal, ap û xalên xwe li zarokên xwe dikirin.

Dîsa tiştî herî balkêş ew bû ku, mikaîlîyan gîştika secera xwe dianîn û bi bavekî va girêdidan, yanî gî ji bavekî bûne. Eger wekîna be, em 8-9 nesil berî



www.arsivakurdi.org

vê bi wan va pismamên hev in.

Li gundî me jî hin mal hene wek me Heci Îbrahîmî ne, ji bera me ne. Lê tu îro here, ji zarokên wana û yê me pirs ke, tu yê bê ku wana tu qe ne meriyê hevûdu ne jî. Kes bi meritiya hev nizane.


Lê îspata wê di goristana Mikaîlîya da ye. Kalî me Yusufî (Us) Heci Îbrahim bi du birê xwe, Îsmail Axa û Hesen va li hêla hev dane erdê. Tarixa mirina wan 1841, 1842 û 1843 ne. Yanî wana Kurdistan dîne û meriyê xwe yî Wan û Agirî nas dikirin. Gorna bavî wana Hecî Îbrahim tuneye. Bi îhtimalek mezin ew li ser rîya koçê, barkirinê da rehmetî bûye. Xwadê ji wa kesana sed cara razî be ku ew kevrana dane ser va gornana.

Bo ku ev tiştana baş bên fehmkirinê, têgihîştinê, min xwest di dawiyê da secerekê ji Kurdistanê û secerekê ji Enqerê wek numûne li jêr binivîsinim û qala hinek wekhevîyên wan bikim:

**Secera Şelwêran / Agrî:**


Ji ber ku meri secera mikaîlîyê Enqerê û Wan-Agrî bide ber çavan, me ev secere dirêj nekir, gîştik negirt vira. Bi vê meri ê wê baştir fehm bike. Birêz Serwet Alparslan ji Agrî ji me re secereke pir dirêj û bi detay şandî bû.

Hatina kalê me digêje nesla Keko û Elîyî Tausê. Yanî kalî me yî herî mezin î ku ji Kurdistanê hatiye Enqerê di wê wextê da jîyaye. Ku em li nava dinêrin wekhevî zêde ne. Di vir da tiştî ku bala meriya dikşîne, ji bo min ev e: Eger kalî me Haci Îbrahim navê du zarokên xwe Hasan û Yusuf lêkirine, ewna ji sedî sed navê bav û kalî wî ne. Ji ber ku berê ew di nav kurmanca da edet bûye. Navê bav û kala yan jî bira li zarokên xwe dikirine. Ku em li navî kalê mikaîlîyên Agri û Wanê jî binêrin ev pir eşkere ye. Wana jî navê kali xwe Yusuf e, Mehmet e. Him jî ew ducar diwe. Di nav navên zarokên wan da jî Hasan heye, Meh heye.




www.arsivakurdi.org

**Secera Mikaîlîyên Enqerê**




Gornê zarokên Haci Îbrahim li gundê Mîkaîla (Inler Köyü-Polatli-Ankara) ne. Li ser gornan jî wekî me li jor jî qalê kiribû, "*Mikaili Hanedani Kadiminden......*" hatiye nivîsandin. Me li vir jî tenê wek nimûne, mînak secere pir dirêj nekir û navê ku bi ya Agri û Wanê va wek hev in, girt. Ji ber ku ez herî baştir secera mala xwe dizanim, min ew wek mînakî girtin. Lê diwe ku li gund û di cem mikaîlîyên din da hin secerên din da jî wekhevî û tiştên bala meriya dikşîne hebin. Ji sedî sed newe jî, qasî ku îmkan ji destê min hat, min xwest ez gera li dû koka xwe bi vî awayî carek din lêbikolim û ji we ra pêşkeş bikim. Hemî faktorên, delîlên ku hebûn li vir hatin bi kar anîn. Kêmasî dibe ku hebin, yan jî tiştên ku ez pê nizanim û negîhîştimê jî. Lê gera min bi dawî bû. Ji vir wê da dil û wijdanî min rehet e. Ji ber tiştê min berhev kiriyre nivisand û êdî nayê ji bîr kirinê...

www.arsivakurdi.org

# DAWETÊN DEMA NÛ

Muzaffer Özgür

Çend roj berî dawetê qert hatibûn belav kirin. Roja dawetê ber malê rêşkirin û avkirin. Lambeyên eletrîkê bi dardakirin. Ji bo mêvanan kursî li ber malê rîz kirin û kon dagirtin. Dol û zurne ji gundê Kutlicamîyê, koma muzîkê jî ji Enqerê anîbûn. Bê dil al li ser xênî têheldan.

Îzina(miseda) dawetê ji jenderme hatibû girtin. Li gor îzinê heta saet donzdê şevê dol û zurne dikane lêkeve, muzîk were pêşkeşkirin.

Di hoperloya camiyê de dawet eşkere kirin. Ji nimîyê nîvro bi şun de însanê camiyê çûn mala dawetê. Xwedanên dawetê li ber malê mîvan xêrhatî dikirin.

Nanê beyraxê bi riya fîrmekê hatibû. Kesê wî karî dikin ê xwarinê bi erebê xwe tînin û karkirên wan xizmetê mêwana dikin. Êdî kewanîyên ku ji daweta, şînan û sunetan re xwarin dikelînin nemane. Telaşa jinan êdî li aşxanan nemabû. Tama şîvên berê jî tunebû!..

Sifrê amade dikirin; xwarin bi lez bela dibû. Şorbe, goşt, pîlav, şîranî û şerbet dîtenan ser sifra. Mîvan qor bi




Li daweteka KAN, Kemalê Amedê

qor li ser sifrê rûdiniştin. Di garajê malê de teleşa xwarinê hebû. Xortên malbatê û cîranan jî xizmetê mêvana dikirin. Yên ku xwarina xwe xwarî oxintîya xwe didan xwediyê dawetê. Yên ku oxintîya xwe didan navê wana li lîstê dinivisandin.

Li mala bûkê telaşê heqîbê û haziriya hinê (hennê) hebû. Mala bûkê merlixîya xwe, cîran û heval dawet kiribûn. Yên dihatin ser heqîbê ji bo bûkê xelat tînan û pîroz dikirin.

Li malê zêve jin, keç û xortanên xwe xemilandî li ereba sîyar dibûn. Kinc û cilên wan dibirîqîn.


Daweta Aysun Kurmuş û Musa Özdoğan/Celika

Li ser erebeyê dengê dol û zurnê ezman didirand. Li ber malê bûkê govend dihat girtin. Bi giranîyê dest pê dikirin, sêgavî û li gora rîtma muzîkê govend dikişandin. Di hundir da jinan henê li destê bûkê dikirin. Jineka salên xwe mezin bang kir ku ma keçik kilamekê bistirên. lê yeka ku kilamekê bi kurmancî bê tunebû. Yekê got:

*Yüksek yüksek tepelere ev kurmasınlar*
*Aşrı aşrı memlekete kız  vermesinler...*

Jinêpîrê di ber xwe da got; "***Xwedê bela xwe bide we, ma zimanê me tune. Klamê me çir bûn?***"

Ji aliyê din de yekê got: "Xaltiyê niha ew mode..."

Êdi êvar bû. Dengê dol û zurnê li ewrên gund da belav dibû. Hemû gundî li ber mala dawetê gehiştibûn hev. Xort, keç, jin û mêran govend dikşandin. Zave û bûkê jî di govende da cîh girtibûn. Li mêvanan çay dihate belavkirin. Çend kesan arak, bîra an jî wîskî-kola vedixwarin. Piranîya wan ji Ewrupa hatibûn. Sohbetên wan li ser dawetê, rewşa welat ya siyasî bû. Li

www.arsivakurdi.org

navbera jî dema ku hîş dihatin sêrî yarni dikirin. Pir kesan bi telefonên destan resm dikişandin. Dawet bi kamerekê jî dihate kişandin.

Dema dol û zurne disekinî koma musîkê dest pê dikir. Stranbêj profesyonel bû. Çend saetan dilê gundîyan şa dikir. Ew ji welat bû. Piranîya kilamên tên gotin li ser şer, xizanî, bindestî, zordarî û welat bûn. Kilamên ji aliyê me jî yek-duduye digotin û xwe pê xelas dikir. Dema însanan klamên aliyê me dixwestin, bersiva wan nedida, nedibîst. û distira:

*"...Siyar hatin peya çûn,*
*Ji ber gurzê gerilla tarimar bûn..."*

Xorta jî fîşekên hewayî vêdixistin. Di bin çîk, alav û ronahîya rengan de ezman dibiriqîn û patapata wan guhê însanan diêşandin. Dengê fîşekan heta gundên cîran diçû.

Tu bê ku ez î li Evrupa me û serê salê têye pîroz kirin!..

Stranbêj distira:

*Oramarê bilind e, zozan û geli, gund e*
*Gerilla lê bûne kom, car havir dor govend e.*

*Canê canê canê, were meydanê,*
*Dilê min pir xwaşê bi vê dîlanê...*

Çend kesên di govendê da destên xwe avetin pişta xwe û sîlehên xwe derxwistin û reqa reqa kurşunan bi stranên tên gotin va govend digirtin. Mezinan digot:

– Wan dabancana çi ne loo, qeza û bela çê dibin, kurik li meydanê ne!..

Mezinekî malê digot:

– Walle min bi xorta nikanî, meriv vêra baş nake. Kî gotina me dibîze!..

Çend kesan xwestibûn kamçî bilîzin. Lê nove nedihate wan. Henin din jî, ji du çal kermê pêz anîbûn, ji motirê jî mazot derxistîbûn. Wan jî dixwest ar dadin û sinsîng bilîzîn. Lê xortan pir dil nebûn û amadekaran jî dest jê berdabûn.

Wextekê bi şûn da dengê musîkê xelas bû. Li gor agahdarîyên hatin gotin wexta pastê bû. Çend deqa bi şûn da li ser maseyekê pasta ji qezê hatikirînî anîn meydanê. Heft katbûn. Bûk û zavê û malbatên wan li dor gehştin hev. Tevûhev pasta hat birîn di nav toz û xalîyê da pasta li zarokan hat belavkirin.

Bi musîka klasîk bûk û zavê li dansê dastîn, çend merivên wan jî bi keçikên xwe an jî bi jinên xwe ra rabûn çûn dans kirin. Dansa modern ku di dema sedsala 17an û 18an da li welatên Ewrupa li koşk û serayên kralan da dihatkirin niha li gundan û dawetan da hebû.

Nîvê şevê bûbû. Mêvanê ji bo oxintîyê hatibûn xatirê xwe xastin û vegerîyan çûn gundên xwe. Dem ne mîna berê bû, erebe pir bûn, rê, banî



www.arsivakurdi.org


Daweta Yeşim Bilici û Îlhan Kilinçalp / Xelika Jorî(Karacadağ)

hebûn. Ne gereg bû mala dawetê serê xwe bixelîne. Oda mevana amade bike. Dol û zurnê dest pê kiribû. Koma arak (alkol) vexwarî rabûn tevûhev govend girtin û stran digotin.

*Wey zalim zalim zalim,*
*ez ne xort im ne kal im*
*Bi xorta re heval im*
*bi qala re li mal im...*

Dema solix didan, zurnê dest pê dikir û diçû li ber govendê disekinî. Çend kesan jî destê xwe davetin berîka xwe pere didan muzîkvanan. Wan dîsa dest bi stranê dikirin.

*Helbê tulbe lêê, fat qilotê lêê*
*Tu çima natî lee lêê, fat qilotê lêê...*

Mêvan giran giran belavdibûn...

Sibê telaşe bukderxistinê bû. Otomobîl ketin rezê. Li nav gund çerx bûn û çûn ber mala bûkê.

Dema bûk ware derxistinê ereba hespa-paytonek- hat. Payton bi balon û kaxizên rengîn hatibû xemilandin. Bûk û zave lê sîyar bûn. Di bin şîng şinga paytonê de Mersedes, Ford, Nisan, WV jî ketin rê. Giran giran dor aliyê gund re çex bûn û hatin mala zêve... Daweteka din jî weng xilas bû.

Her dawetek ku xelas dibe bi xwe re mirasçanda me xizan dike û şûnê edetên me yên hezar salan ku jiyana med qelew kiriye pazarganîyê digre. Pîvanga her tiştî bûye pere û şov!

www.arsivakurdi.org

# Li ser daxkirinê

Altun Başaran

Berê li gundan îmkan wek îro tunebûn. Wexta ku zar nexweş diketin jinan wekî doxtori dikirin, bêpere hem ji gundê xwe ra hem jî ji gundê dorpaş ra xizmet dikirin. Tabikî ne her jinekê. Bi taybetî kesên ku destê wan bi berdewamîyê ev kar dikir. Yek ji van jinan jî li gundê Altilarê, bi navê Hava Ehmed hebû û karê daxkirinê girtibû. Wexta ku zarok bi zikêşî(vijikî) dibûn diçûn ba Hawa Ehmed. Wê li argûnê xwe ar dadida. Dûstan texist ser agir û du ra pêçiya xwe şil dikir, di rejayê dida îşareta xaçê li ser zikê wan, li hundurê destan, li binê ningan û li ser eniya wan dida. Kirş dişkêna, di ser wan ra davit û digot: derbasî be! Dûra diya kurika destmiz didayê. Ji dilê wan da çi dihat ew didayînê.

Wexta ku bûk li çavî însanekî dihat, diçûn ba jina ku bi pismamê xwe re zewicî ye. Porê wê jinê li çavê ku bûk lêhatî didan û ew bûk li çavan wenda dibû.

Dema mîrîstan li laşê yekî dihat ew jî bi hebê cê tev didan, li ser dixwendin û derbas dibû.

Wexta ku yek ditirsî, diçûn bend kolaç dikirin, sê caran, car bi car kut tebû, di vir da xayî dikir ku çiqas tirsiye.

Wexta ku bi zerikê diketin çîr texistin nav mizê didan ber sevrika (stêrk) sê şeva û dûra sê siba li xwerinî sê kefçî vedixwarin.

Wexta ku bi nexwaşiya hespira diketin, di nav genim da hespir dibijartin bi mûjan va li hev diqelibandin û didan nexweş. Ev nexwaşiya pê derbas tebû.

Bavê min ji "kirik/çiqikan" fahm dikir û ji bo wê jî jê ra digotin "qirikçî". Wexta yekî junîyê xwe dişkeşt, siftê yê bi sabûnê rind mista û bişûşta, di dûre cawî ecer dîna mûj li ser cêw lêdixist ew mûşana bi dûre didan ser juni. Dukana xwe hebû. Sandiqên loquma dema boş tebûn ew dixelandin û mujên li ser cawêkî ecer lêtexist ew dixistin ser birînê. Bi wan textên sandiqên loquma pê jûniyê jikeştî dipêça.


Ji bo xwedêdana zaroyan jî li her gundekî yek an du pîrejinên zana hebûn. Dema xwedêdana zarokan diçûn ew jinana wek "ebe" dînan. Li gundê me yeka bi navê Fata Soslî hebû. Keçika wê jî ji dayika xwe hîn bûbû, bi xwe alîkariya xwe dikir, dargûşa xwe bi xwe tîna dunê. Navê wê Rahma Osmên bû. Her salekê zarek tîna dunê. Li gund baxên me li hemberî hev bûn. Di nav baxê wan de kaniyeka ku jê ra digotin "kaniya bi qapax" hebû. Ew bi ducanî bû. Sanciyan da ser, li kêleka ava vê kanîyê dergûşa xwe anî dunê. Ez wê wextê dehsalî bûm. Qet ji bîra min naçê ku wê jina bi cesaret bi serê xwe tenê li kêleka vê kaniyê, di wê çolê de dergûşa xwe anî dunê. Ew xweya bû bi hazirî hatibû. Piştî ku dergûşa xwe anî dunê, bi xwe bi cîletê navika dergûşê birî bi dêzî girêda. Hevalbiçûka xwe xist. Herd kola û hevalbiçûk kir herdê. Dergûşa xwe pêça, koç kir. Wê ew xûn û xezira xwe şûşt, dergûşa xwe xist berbanga xwe û çû mal. Bi rê da xweliya ku mişkî kûr derxistî bi xwe re heyna, li mal ew xaliya germ kir, hen li ser paçan kir û pê dergûşa xwe qindax kir. A mayîn jî di bind xwe re kir, dergûşa xwe kire hembêza xwe û raket. Diya xwe Fata Soslî hate malê jê re gewolek çêkir û da ber.

Erê, jîyan berê li gundên me weng bû. A niha tu nikarî li wan gundana însanên weha bibînî!

www.arsivakurdi.org

# Li ser romana Yusuf Yeşîloz ya bi navê

## *Li hember lehîyê*




DÎ NAVBERÊ RABÛN Û RÛNİŞTİNEKÊ DA

Carcaran her tişt li serhev tê. Li ba dengbêj Alan, egîtê romana Yusuf Yeşîloz ya nû wer dibe:

Zewaca wî ya bi jinika swîzreyî, Dagmarê va dixele. Kêşandinên ji bo CD wî ya nû giran bi rê dikevin. Bi ser van da, nerehetîya wîjdana wî ji ber berxweketina bi keça xwe ya ku bê wî li Tirkîyê mezin dibe, nahêle ku ew bihewe. Serûbinhevrabûna hundurê Alan nîşan dide ku derd û kul di jîyîna wî da çing hatine û tên ber wî. Yeşîloz tecrubeyên merivên din yên ku rastî tahlîyên weng hatine, dide ser: Meyrema tirk ya ku wî pê va kurtehezîyek jinîye û bavê wê Azîz û keça Alan ya ji zewaca berê ku ew bi barkirina xwe ya Swîzrê jê bi dûrketibû. Di katkirin, rojenivîs û dengkirinên wê da behsa lêdanên malbatên li Tirkîyê, wexta ku ew ar û namûsa xwe lekekirî dibînin, tê kirin.

"Li hember lehîyê" rojên ku herdê bin nigên Alan yê pîtnebûyî her çû dilerizandin salix dide. Bi çûyin û hatinên navberê dîwana li kevnexanîyê malbatê yê ku ew lê her du zarokan hinek şevan dike nav nivînan û odeya bêrehetî û kufikî ya ku wî bi lez kirê kiribû, her çû ew dixûşî nav krîzê. Ew ji tradisyon û rûmetdayînên gundê xwe yê li Tirkîyê bi dûr ketibû. Lê dîsa jî tesîra wan li ser jinîya wî, ji pêzanîya wî pirtir bû. Yusuf Yeşîloz vê rêşaşîyê, ya jî zêdetir vê pênekanîya merivekî ku di tengîya navberê du nirxesîsteman da mayî çing di serê Alan da digîhîne hev, cîhên nixmandî yên vê kîtabê ne.

Nivîskar teslîme xagbûnîyê jî nebûye ku pê pirserîtîya psîkologîya rewşê li dawîya romanê sivik bibûya. Ji vê ye ku ne Alan ne jî Dagmar, dema ku wana li mehkemê cihêbûna xwe kirin rê, zelaltir nizanîn ku çi ew ji hev veqetandîye. Xwe li jineke din girtîbûyî rastesebeb bû? Kêmbûna hestên êvînîyê bûn? Yan jî cihêtîyên kulturî bûn yên ku debara rojejîyanê weng berteng kiribûn? Lê dîsa jî hêjayî gotinê ye ku Dagmar û Alan ji bo ku ji hev ra hurmetkar bimînin, rêlêkirîyên rind dîtibûn. Wan vajoyî herikîya çemê pêşhukimîyê ajinî dikirin.

Ev nivîsa di rojnameya Neue Zürîcher Zeitung ya 2ê îlonê 2008an da hatiye weşandin. Nuh Ateş ew ji zimanê elmanî wegerenda kurmancî.

**Bettîna Spoerrî**
**Werger: Nuh Ateş**

www.arsivakurd.org

# ŞOPA ZENGILÊ DIL

Xizan Şîlan

Min li xewa tarûmar, di xewna xwe ya gerok de dil girtibû. Dimeşiyam û dibeziyam bi gavên mereqdar, bi çavên evîndar ku bighêjim wê û ji nêzik ve bibînim. Mereqek hebû di dilê min de, mereqa dîtina bejn û bala delaliya wê. Min hesret dikişand, hesreta sewdayê, hesreta dîtina melûliya awirên çavên wê. Şabûn û coşek hebû di kelkela xwîna rayên min de û bi wê coşê dimeşiyam. Li ber deriyê wê rawestiyam. Bêyî ku di şuna xwe de bilevim, min guhdariya dengê dilê xwe dikir. Dilê min lêdiket, mîna zengilê deriyê wê. Min bi heyecan û bi tiliyên xwe yên diricifî zengilê derî dihejand û lêdixist. Ji nişka ve derî vebû, wê deriyê koşka qefesa xwe vekirîbû ji min re. Dilê ”Z” ye…

Dengê wê yê nazik û nermik di guhê min de mîna dengê Kewa nikulsor bû. Awirên wê yên nazdar weke roja berbangê dibiriqî di bibîkên çavên min de. Tîra brûyên wê yên kevanî mîna xençereke tûj di kezeba min re diçû xwarê. Ez bi dest û pî û lingên tevzînok derbasî hundur bûm. Bi tirs û heyecana laşê xwe ve li ber çokên wê rûniştim. Min bi kesera hêviyên qurmiçî xweşbêhna keziyên wê dikişand cîgerên xwe. Çavên min têkilî çavên wê yên melûl û xemgîn bûn. Piştî demekê çavên wê yên zeytûnî dibişirîn û dikeniyan di giyanê min yên şermok de. Di navbera me de peyva awirên bêdeng dest pê kiribû. Hesreta evîndarî û bêrîkirina salên ku li ber bareşa feleka xayîn berba bûyî ji nû ve li min vedijenî û geş dibûn.

Carnan bêdengiyek, carnan kenekî nazik di navbera lêvên wê yên xweşik de belav dibû li odê. Bêyî ku qedehek mey vexwim serxweş û sermest û heyranê wê dibûm. Kelecana tayeke zirav xwe li bedena min dipêça. Qey tu dibêjî min şûşê araqê bi carekê re di gewriyê xwe re berdabû û ez ji xwe derbas bibûm. Min dîsa keserek û hilmek ji cixara xwe kûr kûr kişand. Carnan di navbera bêdengiya me de awirên min ji çavên wê dûr diketin û min li derdora xwe temaşe dikir. Li dîwaran, wêneyan, çîçekan û li şewqa finda ku bi coş vêdiketî mêze dikir. Diponijîm, ketibûm nav ramanên kûr û ji xwe gelek dûr ketibûm. Pêjna laşê min li nav pêlên deryaya jankêş winda bûbûn, dîl hatibûn girtin û fetisî bûn. Min çavên xwe berdabûn noktekê û bi tîrêjên awirên xwe yên xemgîn li derdora wê nokteyê semah digerand. Ew nokte, êşa tenêtî û perîşaniya min ya li kolanên xerîbiyê bû. Sewda, nasname, stran, dîlan, bêrîkirin û hesreta Welatê

www.arsivakurdi.org

min yê bindest bû. Min dixwast, êşa kul û kedera sîngê xwe, bêdengî û jana xwe li ser wê nokteyê biperçiqînim, bihelînim, pê bigrim bişeqînim, bavêjim û tune bikim bi agirpêta çirûskên awirên xwe yên bizdonek. Finda ku li ser masê vêdiketî hêz û coşek dida pêlên kaniya hestên min yê newêrek. Min çavên xwe kiribûn qelem û firçe, dilê wê jî tabloya spî. Min firçeya xwe li ser tabloya spî digerand;

Wêneyê baxê gula sor; li gulîstana biharan dibişkivîm û bi bêhna qurnefîlan ber bi wê ve difûrîm.

Wêneyê stêrkan; li koretariya şevereşên xewle di gerdûna nava xwe de dibiriqîm û ber bi wê ve dixwericîm.wêneyê xanîyekî biçûk; li şevên oda wê dihewîm, di hembêza wê de radimedîm û dibûm zavayê textê bûkaniya wê.wêneyê ewrên reş û tarî; min perdeya toz û dûmanê çolistanan diçirand û bi rengê keskesora dilê westiyayî ber bi wê ve dibezîm.

Wêneyê gola baranê; min di bin şil û şepaliya dilopan de sakoya eşqa hesretê li xwe dikir û ber bi wê ve diherikîm.

Wêneyê kuliyên berfa spî; li seqema zivistanên sar û li ser rêya qeşa girtî bi gavên şemitok ber bi wê ve dipekîm.

Bi wêneyê xwendina çûkên asîmanan re, min jî mîna bazê zinaran baskên xwe diçirpand, radiperîm, serî radikir û ber bi wê ve difirîm.

Xoşewîsta ku giyanê min yê çilmisî û hêviyên derbeder bûyî ji nû ve vejandî û ken û şadî li min bexşandî… Dilê ”Z” ye…

Em li derve, li nav daristanan digeriyan. Pelên daran diweşiyan xwarê û bayekî hênik yê Payîzê rûyê me mizdida. Ji ber bayê hênik laşê min diricifî. Kenê wê yê nermik, dilgermî û dengê wê yê şîrîn û nazik, porê wê yê xwemrî û hunandî, bejna wê ya fîdanî, germiya qefesa wê ez dîn û sergêj û sermest kiribûm. Laneta bîranînên qurmiçî li min şad dibûn. Ez ji nû ve hatibûm afirandin û bêhna jiyaneke aram li ber pozê min difûrî. Coş û heyecan û hesteke şad xwe li tenêtiya şevên min radipêça. Weke gul û çîçeka ku çilmisî ji nû ve bipişkive û şîn bibe jiyan jî li min xweş û geş dibû.Min bi maçên xwenava lêvên hesretkêş gerdana wê ya spî bi morî û mircanan dineqişand û ew tevî hezkirin û bêrîkirina salên bihûrî hembêz dikir.

Ez êsîrê şewqa awirên wê yên di çirîsandina stêrkan de diçirisî…

Ez mehkûmê tiliyên wê yên qolincên min mizdida…

Ez êsîrê germa henasa wê ya dilnerm…

Ez bi dil û mêjiyê xwe ve û bi laş û giyanê xwe ve mehkûmê wê bûm.

Belê dixwazim wê gavê û wê demê bijîm. Ne rojên bihûrî, ne jî rojên dahatû…

Bes haz û heyecana wê gavê û bextewariya wê demê…

Mehkûmek di zîndana dilê wê de…

Dilê “Z” ye…

***2008-11-11Stockholm***

www.arsivakurdi.org

# Di şerê Çanakkaleyê de ciwanên kurd

Rohat Alakom



Beşek ji bergê pirtûka Emîne Uçak Erdoğan.

Heta niha di derbarê beşdarbûna kurdan di Şerê Çanakkaleyê de kêm tişt hatine nivîsîn. Gelek kurd çûne Şerê Çanakkaleyê û venegeriyane! Wek mîsal tenê li gundê Xelika (Karacadağ) bi dehan kes şehîd ketine, kilam li ser wan hatine gotin.[1] Nivîskar Emîne Uçak Erdoğan, di pirtûka xwe ya nû de qala kurdên ku di Şerê Çanakkaleyê de birîndar bûne û li wê derê şêhîd ketine, dike.[2] Ev cara yekem ku kurdên di Şerê Çanakkaleyê (1915-1916) de cîh girtine, dibe babeta pirtûkekê. Yek ji wan kesên ku çûye Şerê Çanakkaleyê, lîstikvanê futbolê Celalê Kurd bûye. Di Koma Galatasarayê de lîstiye. Di nav wan kesên ku di vî şerî de birîndar bûne û mirine, komeke mezin ji kurdên Anataoliya Navîn in. Wek Malbata Hesiko ji gundê Yenîceyê. Ji vê malbatê herdu bira, Mûsa û Tahir diçin Şerê Çanakkaleyê, lêbelê herdu jî di vî şerî de şehît dikevin.[3] Nivîskar di dawiya pirtûka xwe de her wisa jî lîsteke çavkanîyan pêşkêşî xwendevanan dike û di nav wan de çend çavkanî hene ku dikarin di pêşereojê de kêrî lêkoleran bên.[4]

Emîne Uçak Erdoğan, gelek kes dîtine û bi wan re hevpeyvîn kiriye. Bîranînên wan rokiriye ser kaxiz. Ji wan kesên ku dîtine û bi wan re peyivîye, hinek ji wan

1 Nuh Ateş, Kilama Şêxê Hec Elî, Bîrnebûn, nr 32/2006.

2 Emine Uçak Erdoğan, *Çanakale Savaşı'nda Kürt Civanları*, Yarımada Yayınları, 2008.

3 Emine Uçak Erdoğan, *Çanakale Savaşı'nda Kürt Civanları*, rûp.69-70.

4 Halit Bilici, *Balkan Savaşlarından Milli Mücadelenin Sonuna Kadar Haymana Kazasında Şehid Olanlar Üzerine Bir Araştırma*, Konya, 2005. Mehmet Demirtaş, *Doğu Anadolu Nüfus Hareketi*, Yüksek Lisans Tezi, Van, 1996.

kurdên Anatoliyê ne. Yek ji wan jî Selahattîn Duman e. Ew ji eşîra Şexbizînî ye, wek nivîskar û rojnamevanekî navdar li Tirkiyê tê nasîn, vê gavê di rojnameya Vatan de kar dike. Selahattîn Duman, di vê pirtûkê de dûr û dirêj qala kalkê xwe, Harûn Efendî dike ku di Şerê Çanakkaleyê de birîndar bûye û paşê li Suriyê leşkerî kiriye, li wir maye, tam heşt salan leşkerî kiriye. Harûn Efendî di sala 1889an de li gundê Yenîcê hatiye dinê. Ew, di xortaniya xwe de çûye medresê, xwendin û nivîsandin fêr bûye û dest bi nivîsîna helbestan jî kiriye. Selahattîn Duman, kalkê xwe wek kesê ku asoyê wan vekiriye, dide nasîn: "Vîzyona wî pêşîya malbata me jî vekiriye". Harûn Efendî di sala 1914an de diçe leşkeriyê, piştî ku cepheya Çanakkaleyê vedibe, di sala 1915an de wî dişînin wê hêlê. Di şer da birîndar dibe.

Dizewice, kurek jê re çêdibe (Abdullah Duman, bavê Selahattîn Duman). Piştî demekê jina wî dimire. Abdullah bêdak û bêbav, sêwî dimîne. Gelek tişt têne serê Harûn Efendî. Harûn Efendî jina xwe re wextere dirêj namîne. Herwiha Abdullah jî dayîka xwe têr nabîne. Piştî Şerê Çanakkaleyê, vê carê wî dişînin enîya Sûriyê. Dema ji wir tê, vê carê di sala 1921an de Şerê Rizgariya Tirkiyê dest pê dike û Harûn Efendî li tevî vî şerî dibe. Jîyaneke gelek tirş û tal li serê Harûn Efendî re derbas bûye. Li jêr min beşek ji bîranînên Selahattîn Duman wergerande zimanê kurdî û hêvî dikim ku serpêhatiya Harûn Efendî bala xwendevanan bikşîne.

**Serpêhatiya Harûn Efendî**

"Eger ez îro heme, belkî jî deyndarî Şerên Çanakkaleyê me. Kalkê min ê rehmetî Harûn Efendî di enîya Çanakkaleyê bi du gullên Îngîlîzan ve birîndar bibû. Piştî qenckirina wî, ji nexwaşxaneyê derxistine, sê mehan bi îzna tebdîl-i hava (hine guhartin çêbe) şandine welêt. Ew jî bi lez û bez li gund zewiciye, jina xwe ango dayîka bavê min bi ducanî hîştîye û vegeriyaye nav yekiniya xwe. Bavê min, dema bavê wî li eniya Suriyê bûye, hatiye dinê. Bavê min jî, min wek xelatekê dîyarî mirovatiyê dike. Ji kuderê heta kuderê. Dema Îngîlîzan guleberî kalkê min dane, sankî di hundirê xwe de gotiye "Bi xêr be" û bûye sedemê min. Ji ber ku ez van zanim, Şerên Çanakkaleyê dikevin nav sahaya mijûlîya min a dereceya yekem. Ez hemû lîteratûra ser Şerên Çanakkaleyê rêz bi rêz zanim.



Harûn Efendî (kesê bi palto)
û kurê wî Abdullah Duman (bavê rojnamevan Selahattîn Duman) bi malbata xwe re.

Li wir (li Suriyê), hêrsa ereban gelek ji Ittîhatçiyên ku ceyranên netewetîyê û tirkîtiyê diparastin, sîyasetên ji ummetê dûr dişopandin, dihat. Leşker didan ber lêpirsînan. Tiştên xirab tînin li serê kesên tirk. Kalkê min kurdî zane. Di nav demeke kurt de kurdî hînî cînar û hevalê xwe yê şer Mewlud Efendî dike. Herduyan jî dema ku gotine, ew kurd in, ji ezîyet û mirinê xelas bûne. Piştî salan min Mevlûd Efendî li Haymanayê dît. Dikana manîfaturayê ya kalkê min hebû, ya wî jî kêlekê bû. Mewlûd Efendî, kişmîş fêkî û sebze difrot. Du dikanên nêzîkî hev. Neyse em dirêj nekin. Ev berdane. Lê ew nizanin, wê çawa vegerin. Kesekî ku di Ordiya Osmanî de kar kiriye û piştî veqetandina Suriyê li Şamê serbazî kiriye, van nas dike. Vî serbazi li wir di dibistanekê de sereketî dikir, kalkê min wek hademe (berdestî) hildaye ser kar û jê re maaş girêdane. Bi pereyên kalkê min ve erebeyek ji Mewlûd Efendî re stendine. Wî jî leblebî qelandine, firotine. Li Şamê hêvîya geştiya bi navê Gulcemal mane ku bê wan hilde bibe. Piştî du salan karibûne vegerin Îstenbolê.

Kalkê min di Belavbûna Kutahyayê de (1921) vê carê jî wek dîl dikeve destê huriman (yunan). Leşkerîyeke bi bela. Şerên Sakaryayê  gişt li wan derên gundê



www.arsivakurd.org

me qewimîn. Jin dema dinêrin hurim tên xwe li çiyan vedişêrin. Ji bo ku bavê min bêdê û bêbav, piçûk bûye li mal ji bîr dikin. Ebeya me hebû. Keça pizmamên me, qet mêr nekiribû. Me jê re Ahraz digot. Nedipeyîvî, bê zar û ziman, lal bû. Ew, nîvê şevê hatiye gund hin tiştan hilde. Dema hurim dîtine derketiye ser banê xênî di kulekê de hundir mêze kiriye. Huriman nihêrîne di nav nivînan de zarokek digrî. Orxan avîtine ser, çûne. Ahraz hatiye bavê min hildaye biriye serê çîya"

Kalkê min piştî leşkeriya 8-9 salan, vegeriyaye gundê xwe. Bavê min wê demê 7-8 salî bûye. Neçûye dibistanê. Ji bo ku di malbatê de jimara nifûs kêm bûye, apê wî xwestiye wî bike şivan. Lê belê kalkê min qet guh nedaye yek ji wana. Şandiye dibistanê. Li hemberî hemû dijayetîya dorber, bavê min bûye kesê yekem ku li wê heremê lîse û unîversîte qedandiye. Doxtorê yekem e nabêjim, yekem kesê ku unîversîte qedandiye. Vîzyona wî pêşîya malbata me jî vekiriye".

Kalkê Selahattîn Duman, Harûn Efendî di sala 1961an de li Haymanayê di mala xwe de diçe dilovaniya xwe. Di dawiya bîranînên xwe de Selahattîn Duman vê carê behsa kalkê xwe yê mayî (bavê dayîka wî) dike ku çawa tenê çar rojan! leşkerî kiriye, du tîp leşkeriyên ji hev cihê:

"Bavê dayîka min axayekî xwedî erd bûye. Danzdeh, sêzdeh gundên wî hebûne. Piraniya pîyasaya goşt li Îstenbolê di destê wî de bûye. Dema çûye leşkeriyê qasî 400 zêr bi xwe re biriye. Ji wan 60 zêr wek bertîl daye qûmandarê xwe. Di demên din de fena ku leşkeriyê dike, berdêla ku wan pereyên daye li şuna wî îmze hatiye avîtin. Paşê dokumenteke sexte ya terhîsê amade kiriye. Dema ku bertîl daye qûmandar, wê demê tenê çar rojan leşkerî kiriye. Dema behsa vê yekê dikir, çîrok xelas nedibû. Mirovekî gelek aqil û hêja bûye. Di dema Îsmet Paşa de bû parlementer. Ji bo ku du tîpên cihê nîşan bidim, dibêjim. Yekî çar roj leşkerî kiribû, di her firsetê de qala wê dikir, yê din jî 8-9 sal leşkerî kiribû, serda jî ev leşkerî bi ezîyet derbas bibû, qet behsa wê nedikir".[5]

5 Selahattîn Duman li vir behsa kalkê xwe Omer Kart dike. Binêre: Rohat Alakom, Orta Anadolu Kürtleri, Evrensel Yayıncılık, 2004, rûp.72-76.

www.arsivakurdi.org

# EŞÎRA BİLİKAN

## çendek hayadarî li ser tarîx û warên wan

Nuh Ateş

www.arsivakurdi.org

**Şîfreya tarîxa eşîran**

Ji hêlekê da, tarîxa kurmancan di tarîxa eşîrên wan da veşartîye. Yek ji hacetên ku meriv xwe pê bigîhînê kanîyên tarîxa eşîran navên wan in. Navên eşîran şîfreya tarîxa wan in. Ku meriv xwe li navên wan bigre û lêbigere, ew ê bigihê kan û konaxên tarîxa wan. Navên eşîran kêm hatine guhêrin. Ku eşîr çûne ku derê navê xwe bi xwe ra birine û li cîh û warên ku lê êwrîne kirine. Bi vî awayî navên xwe nemir kirine û bi hezaran salan jiyandine. Lewma jî navên wan ketine çavkanîyên kevn yên dema entîk û klasîk. Ji ber vê jî meriv dikane di saye navên eşîran da xwe bigîhîne zanîstî û hayadarîyên li ser tarîx û warên wan. Çendek hayadarîyên li ser tarîx û warên eşîra bilikan yên ku min ji hinek çavkanîyên li ber destê min berehevkirine ji bo piştrastkirina vê dîtinê nimuneyeke lêhatî ye. Aşkere ye ku bê tarîxa eşîr û herêman tarîxa milî û gîştî nayê serhev û stûnekî wê yê kêm bime. Her çiqas Tirkîye ji serî da xwastîbe ku navên eşîrên kurmanc û yên gund, qeseba, qeza û bajarên wan bi rêya înkarîyê û tirkîkirinê bi bîrkirin bide, bi ser neket. Vajoyî vê, ev rûreşî û xêrnexwazî hîro li rûyê we dikeve. Kurmanc li nav û nîşanên xwe xwedî derdikevin û daxwaze qebûlkirina wan dikin. Li vir hejayî gotinê ye ku pêzanîya bi tarîxê li hêla zimên û çand faktorekî giring e ji bo nasnemaya etniyî û milî.

**Bilikan li ber pozê paytexta Tirkîyê**

Ji eşîra bilikan hêlek li başûrê paytexta Tirkîyê, Enqereyê xwedîmal e. Hejmara bilikan li vê derê bi tehmîn 4-5 hezar e. Li vir 9 gundên bilikan hene û bi ser qezaya Enqereyê, Şereflî Koçhîsarê va ne. Gundên bilikan li başûrê Enqereyê dikevin û 90 û 100 kîlometreyî dûrî nava Enqereyê ne. Navên gundên

bilikan ev in: Akarca (Gera), Aktaş (Mihîna), Büyükdamlacik (Hesina), Büyükkışla (Qişle), Doğankaya, Kanlıkışla (kanîya qişle), Küçükdamlacık (Hecîyo), Odunboğazı (Qeyner), Yusufkuyusu (Textalya)[1].

Bilikan li Anatolîyayê bi kurmancî deng dikin. Bi heldana Harun Coşar [x] zaravayê bilikên Enqereyê nêzikî yê herêmên alîyên Semsur, Entab û Bîrecîkê ye. Bilikanî li ser dîne Mihemed in û didin pey mezhebê sunnî-henefî. Gundên bilikan li vê herêma nava Anatolîyayê di zik hev da ne û li bakur û rojavaya bakûrê gola xwê dikevin. Ew li bakûrê bi gundên eşîra Hêcîban (Bala-Enqere) li rojhelatê bi gundên kurmanc yên bi ser qeza Kuluyê (Konya) va ciranê hev in. Bilikan li ser herdê paytexta Tirkîyeyê ne bi tenê ne. Di nav hududên Enqereyê da li qezayên Bala, Haymane û Polatliyê gundên kurmanc yên eşîrên hêcîban, şêxbazan (şêxbizin), rutan, canbegan, zirkan, şêxan, mikaîlî, têrikî û sêvkî jî hene. Li ser hev, yên bilikan jî tevê 104 gund û qesebayên kurmanc li ser herdê Enqereyê hene [2]. Gerek e bê gotin ku pir kurmanc li nava Enqereyê û qezayên wê, Bala, Haymane û Polatliyê xwedîmal in. Hayadarîyên di vê nivîsê da bi me dinimînin ku bilikan eşîreke nas û nav da ye.

**Navê Bilikan**

Di çavkanîyan da navê bilikan bi van çeşîdan jî hatiye nivîsîn: balochan, belcanae, belican, belekan, balekî, balekan, belan, belekî, balik, balikan. Bilikîyên Anatolîyayê xwe bixwe bi navê bilikî û bilikan didin nasîn. Ji cîranên wan yên kurmanc jî hinek ji wana ra dibên, bilikan yan jî bilikî. Ji ber vê jî min di vê nivîsa xwe da bilikan bikar anî.

Ma navê bilikan ji ku tê û kîjan awayê bilêvkirinê rast e? Bersiva van pirsan ne hêsan e, ji ber ku tu çavkanî û delîl li ser vê mijarê di dest min da tunin. Hendik be jî navê bilikan, wekî xweya ye, li gorê dem û dewranan hatiye guhêrîn û va jî tiştekî normal e.

Bi dîtina min bilikan yan bilikî ji hêsankirin û bilezgotina navê belekan yan belekî peyda bûye. Gumanek e ku navê bilikan ji peyva belekan hatiye der û belekan jî digêhe Beloxan. Lê va gumanek e û ji ber vê jî, kokê navê bilikan wekî mijareke rewayî lêkolînê dimîne.

www.arsivakurdi.org

**Keyatîya Baloxan li hêla deryayê Hazar**

Ji heft keyatîyên (mîrnişîn, qiraltî) kurmanc yên ku berê bi ser Împeretorîya Partan (1-225 paş Îse) û paşê bi ser Împeretorîya Kayosî û Sasanîyan (226 - 500 paş Îse ) va bûn, yek Keyatîya Bilikan (Balochan) bû. Cîh û warê vê keyatîyê li rojavaya başûrê deryayê Hazar û nêzîkî bakûrê navanda welatê Medyayê diket [3]. Di nexşa 21 an ya ku Îzady amedekirî da warê vê Keyatîyê li herêma Makranê, li başûrê rojavaya Îranê jî hatiye nimandin. Gumanek e ku binemalîya bilikan digihê keyatîyên baloxan. Rojavaya welatê Ezerbeycanê herêmeke ku kurmanc lê her dem niştecî bûne. Îzady ji tarîx û coxrafyazan Yakubî neqil dike û dibê, di sala 891ê paş Îse da nifusa Ezerbeycanê ji du xelkên îranî peyda dibû, yek ji wana ezerî yê din cewanî (caf) yanê kurmanc bû. Îzady pê da dihere dibê, ji xêyrî kurmancên caf, bilikan (belikan), gergerî û badkî jî li rojavayê Ezerbeycanê dijîyan û îro jî eşîrên bi navê bilikan, baz û bazayn li wê herêmê dijîn [4].

**Bilikan li kevîya deryayê Spî**

Yek ji cîh û warên ku bilikan lê jîyane Eskenderûn û derûdorên wê ne. Di demên klasîk da bilikan li ser xetê Enteqîya-Eskenderûn-Edeneyê li kevîyên çîyan niştecî bûne. Geh gihêştine kevîyên deryayê Spî û geh jî berbi rêzeçîyayên Nurheq û Balik kişîyane. Nivîskarê romayî Plîny nêzîka 2000 salan ber vê, di sala 100ê paş Îse da, di nav eşîrên vê heremê da navê bilikan jî heldide [5]. Kurmanc di esrên klasîk da niştecîyên Enteqîya, kevîyên deryayê Spî û çîyayên Emenosê bûne. Keyayên Helenîyê Selokîd, di ber gîştan jî Entîyaxosê duduyan hewldaye ku di sala 300ê paş Îse da kurmancan li bajarê Enteqîyayê û xelîcê Eskenderûnê bi cîh bike. Pir malbatên ji keyatîya konfederasyona bilikan (belcanae) û barazan (Veras) li van navendên bazirganîyê êwirîne û bi serdarên romayî va ketina nav dan û standinê û eleqayên jihev bigîhanîyê. Kurmancên çîyayên Emanosê di herdu şerê navbera romay îro û farisan (260ê paş Îse û 538ê paş Îse) yên li ser bidestxistina Enteqîyayê da li hemberî farisan Enteqîya parêztine [6].

**Belkanîya, welatê Bilikan**

Bakur û rojavaya bakûrê Helebê, yanê heremên hududê Tirkîye û Surîyeyê yê îro yek ji kevnewelatê bilikan

www.arsivakurdi.org

e. Zanayê caxrafyayê Ptolemy (90 -160 paş Îse) ji vê heremê ra gotiye, Belkanîya [7]. Hennerbichler di nav kevneeşîrên kurmanc yên ku derengtir di sedsala 6ê paş Îse da li welatê xwe bi şûn û war in, navê bilikan (belikan) jî heldide û Entabe wekî warê wana nişan dide [8]. Hêleke mezin ya bilikan li bakûrê Çewlikê û başûr û rojawaya başûrê Entabê rûdinê û elewî ne. Bilikên Çewlikê bi dimilkî û yên Entabê bi kurmancî deng dikin [9]. Li gorê çavkanîyên osmanîyan bilikan (belikanli) li Semsur, Nîzib, Sêvaz, Mereş, Rakka, Dîyarbekir û Erzurumê bi cîh û war in [10]. Gundekî Nîzibê (Entab) bi navî Kavunlu heye. Navê xwe yê berê Belkî(s) e, paşê guhêrîne kirine Kavunlu. Xerebeya Zeugma-Belkîs ya entîk di nav hududê gundê Belkî(s) da ye. Dibe ku va herêma bi bilikan (belkî) hatiye navkirin û Hêlênan (Yonanên berê) ji bilika ra gotibin belkîs. Di malpera amîdakurd da, navê Nîzîbê bi kurmancî belkîs hatiyê destnîşankirin [11].

**Koçberîya dema klasîk**

Ji ber sebebên pir çeşîd eşîrên kurmanc di dem û dewranên klasîk da malbarkirine û şûngûhêrîne. Di vê rêwîtîya koçberîyê ya ku bi sedan salan ajotiye da eşîr ji hev da ketine, hêl bi hêl bûne û çûne li herêmên curbecur êwirîne. Bi ya Îzady, va koçberîya dema klasîk di navbera salên 500î ber Îse û 500î paş Îse qewimîye û berîyê wê jî ji başûra rojhelatê berbi rojavaya bakûrê bûye. Kêm be jî, nimûneyên koçberîya kurmancan ya vajoyî vî îstîqametî yanê berbi heremên li rojhelata Îranê, Kirman, Sîstan û Belucîstanê pêkhatî hene [12].

**Bilikan û Belucan**

Îbnî Hewqal û Lawê Xelikan û hin kesên din jî îdîa dikin ku belucî nevîyên koçberên kurmanca ne [13]. Xweya ye ku navê belucan û bilikan (belekan) li hev tên, tê bibejî ew ê ji kokekî ne. Di serdema Sasanîyan da belican bi destê Anuşîrewan yê II an (591 – 579 paş Îse) û Xosrewê II an (591 – 628 paş Îse) surgune heremên volkanîk yên li durî rojavayê Makranê kirine. Gumanek e ku van belîcanan paşê di îstîqemetê sûrgunê da berbi bakûra rojavayê barkiribin û belucî ji wan peyda bûne [14]. Ji aqilan ne dur e ku belican û bilikan ji kokekî bin. Belucî bixwe Surîyê wekî welatê bavûkalên xwe nîşan didin [15]. Hewceyî gotinê



www.arsivakurdi.org

ye ku zimanê belucîyan bi kurmancîyê va nêzikî hev in û ji malbatekê ne.

**Bilikan li hinek cîh û warên din**

Li bakûrê Rewandizê gundekî şên û ava bi navê balekan heye. Balekan li wê herêmê xwedîyê 60 gunda ye [16]. Van Bruînessen di beşa duduyan ya berhema xwe ya li ser eşîr, sereşîr û komen neeşîr da qala eşîra bilikan (balik) ya li vê herêmê dike [17]. Di nav eşîrên Bedlisê da navê balekîyan wekî bereke bilbasî derbas dibe [18]. Belikan/Belîcan li bakûrê Gimgimê (Varto) û başûra Zarayê (Sêvaz), li mintiqeya navberê Maku, Beyazîd û Qersê xwedîmal in [19]. Li gorê hinek çavkanîyên din bilikan (belekan) li Qeregeçî (Ruha) li Birecîkê (Ruha), li Mûşê, li Meletîyayê (Balan), li Sasonê (Belekî), bi şûn û war in [20]. Di nav eşîrên ku ji paşê da teve Konfederasyona Milan bûyî da navê bilikan (balekan) jî derbas dibe [21].

**Pêzanîya Bilikan Bi Çêroka Mil û Zil**

Mil û Zil du birên kurmancan yên binyadî ne û wekî Milan û Zilan jî tên binavkirin. Eşîrên kurmanc bi koka xwe digihên Milan yan Zilan, wer dibê Celadet Bedirxan (bi navî Herekol Azîzan) di nivîsa xwe ya bi navê "Mil û Zil" da [22]. Mil çi ne û kî ne, Zil çi ne û kî ne, kes bi awayêkî pak û zelal nizane. Bedirxan di nivîsa xwe da li bersiva van pirsan gerîyaye lê negihêştiye encameke têr. Di lêgera xwe da ew î sala 1919an li Zaxoyê raste kalemêrekî hatiye û wî jê ra çêrokek li ser Mil û Zil kat kiriye. Kalemêr jî ev çêroka ji yekî ji welatê jorî bihîstiye. Li gorê vê çêrokê mêrek li serê çîyayê agirî dijinîye. Navê xwe kurd bûye. Mêrekî gir mîna dêva bûye. Rojekê berfendeyek bi ser warê wî da hatiye xwarê, mêrik tev eşîra xwe di bin berfê da mane û mirine. Tenê du lawên wî filitîne. Ew ê wexta afatê li qûntera çîyê bûne. Navê yekî Mil û navê yê din jî Zil bûye.

Bedirxan dema ku nivîsa xwe ya li ser Mil û Zil ji bo çapê xelas kiriye, ji nivîsevanê Hawarê, Mîrze Rastedar ra xwandiye. Rastedar gotiye, "li deşta Mûşê eşîra belekan heye. Şevekê ez bûm mêvanê wan. Wan ji min ra çêroka Mil û Zil gotin. Xelkê belekan tev de pê dizanin. Tişte ku tê bîra min Mil û Zil birayên hev bûn, pev çûn û ji hev veqetîyan" [23]. Bi ya Rastedar bilikan gîşt bi vê çerokê dizanin. Ma pêzanîna bilikan bi vê çerokê ji ku da tê? Hen ne ejdadên wan ji nêzik da bûbûn şahîdê vê serhatîyê!?

www.arsivakurdi.org

### Çêm û çîyayên Bilikan

Li jor jî min gotibû, eşîran di rêwîtîya koçkirina xwe da ku çûne li ku derê êwirîne, navên xwe li çem û çîya, deşt û banî, gelî û kanîyên wê derê kirine. Di saye vê da jî ligerîna li şopên tarîx û li cîh û warên wan sivik û hêsan dibe. Gerok û zanayê îngliz D.Taylor di gera xwe ya sala 1866an Kurdistan û Ermenîstanê da, di nav eşîr/qebîleyên çîyayên Sasonê da navê bilikan (balikî) jî heldide û di derheqa wan da hayadarîyên balkêş dide: "Herêma çiyayî ya Sasonê li ser navê balikî tê zanîn. Li wir qebîleya kurmanc balikî ya serbixwe û şernas dijine. Ew ne xiristîyan ne musliman û ne jî sersur (qizilbaş) e" [24]. Di sedasala XIXan da, yek ji herêmên di bin fermandarîya Mîrîtîya Soran da herêma belikan (balakan) bû. Li vê herêmê, li alîyê Rewanduzê çem û çîyayen bi navê bilikan (belekan) hene [25]. Li Batmanê Şikeftên bilikan (belekan) hene [26].

*Elmanya, Maînz, 04.12.2008*


**Çavkanî**


[X] Harun Coşar Bilikî (ji gundê Qeynerê) ye. Ew li Swedê diji û yek ji avakarê Weqfa Kurdên Anatolîya ye
[1] www-bîrnebûn.com /Gund û Bajar
[2] ç.b.v. (çavkanîya ber vê)
[3] Merhdad R. Îzady, El Kitabı - Kürtler, nexşên (xerîte) 20-21, rûpel 104, 107
[4] ç.b.v., r. 1001-102
[5] ç.b.v., r.36
[6] ç.b.v., r. 91
[7] ç.b.v., r. 160
[8] Ferdînand Hennerbîchler, Dîe Kurdên, r. 179
[9] M. R. Îzady, El Kitabı Kürtler, r. 176
[10] Cevdet Türkay, Osmanli İmparatorlugunda Oymak, Aşîret ve Cemaatlar, r. 240
[11] Nûhat Akdag, Navê Bajaran, www.amidakurd.com /
[12] M. R. Îzady, El Kitabı, Kürtler, r.188
[13] ç.b.v., r. 188 û M. Emîn Zekî, Kürdistan Tarihi, weşana beybûn, r. 29.30
[14] M. R. Îzady, El Kîtabı, Kürtler, r. 200
[15] www.missionsmanschaft-rotes-meer 1
[16] C. Rojbeyanî: Şerefxan Bedlîsî, Şerefname, weşana apec, jêrenot 370, r.500
[17] M. M. Van Bruinessen, Axa, Şêx ve Dewlet, r. 108 . 111
[18] Ş. Bedlîsî, Şerefname, r. 381
[19] M. R. Îzady, El Kitabı, Kürtler, r. 42 û nexşeya 9an r. 172
[20] Goran Candan, Zarathustra News: www.xelkedondirme.com /dîrok/eşîr
[21] Eyüp Kiran, Kürt Milan Aşîret Konfederasyonu, r. 81
[22] Kovara Ronahî, Hejmar 12, sal 1943, r. 12-14
[23] ç.b.v., jêrenot, r. 14 û Eyûp Kiran, Kürt Milan Aşîret Konfederasyonu, r. 65-74
[24] Dr. Celîlê Celîl, XIX. Yüzyil Osmanli İmparatorluğunda Kürtler, r. 24-25
[25] ç.b.v., r. 72 û M. R. Îzady, El Kitabı, Kürtler, r. 171
[26] mapsof.net/Belekan_Magaralari.


www.arsivakurdi.org

# Allê Oxçî

Bekir Dari



www.arsivakurd.org

Ezî li bin darê Tûyê rûniştîbûm û min çav li ser dersên ilm û fîlozofîyê çerx dikir. Her ku roja imtîhanê nêzîk dibû helêcan û hezîyanê bedena min zêde dibû û tirs dihat li hêlûnê xwa mexel dihat. Her dem wa yê ûsa bû. Wextê îmtîhanê tirs dihat di qafesê sîngê min da hêlûnek çê dikir û di wir da dijîya. Ne min bi şa dikir ku ez wê bikewitînim ne jî tirsê dixwast ku here. Li kêleka min a rastê çemê İkizarası bi kîlle-wîlleka, şên û şahî dixûşê bi ser bajarê Kirşêre de. Ro, di navberê pelgen darê ra bi min ra dikenê û ez î ku bibhecême ji hersan re. Di dilê min ra derbas dibê ku herim xwe bavêm hundirê çêm û ma ez jî, tirs jî bifetisin. Di vê navberê da qîrînîk ji axzê malê da hat.»Bekoo, beko !« Mîna ku tirsa min ne bes e, mine wa jinka e ku hundir li min biqetînê. Firsendê nede min, ku ez tirsê xwe bavême çêm û bikujim. Ez ji şunê xwe firrîyam û min pirtûka feylêzofîyê çeng kire çêm û ji îmtîhan û zanyarî xilas bûm. Min, oooox ooxeka kûr kişand û bersiv da wê.

»Zeqûm, zêhêr >va pêyvan min bi dizekî di hundirê xwe da got û aşkere

ji min dengê xwê rakir kire qîrrînî<, Çî ye xaltê? çi bû?« Ez berva derîyê malê çûm. qasî demeke bi şunda wê got: »Beko, qurrbaan pêgê wa yî disa herişîyê kap-kacaxa ku bifroşê«. Min gihot: »Eyy waax! Erişte çû.« Xaltîyê şor dayîbû min ku ew ji me ra bi nîvro xarînê êrişte çêke. Bi navê xwedê be ku min bîra êrişte kiribû. Lingê min ne xwastin ku herin cem wê. Bêçare ez çûme herdê deng. Manzerê ya ku min dît ez ji we ra bahs kim ku ma hûn bi şahîdê min bin. Vallah ne hûn tenê ma dinya û âlêm bi şahîdê min be.

Ez ketim hindur. Ji mawbênîyê derbasî êvligê (mitfak) bûm >çimkî deng û qîlle-wîll, ji wir dihat.

Apê All, î li ber refê kab-kacaxa dawestîyê û bi aseyê (Baston) xwe dixwazê ku di refê bilintirîn bigêhêje û qabeka paxir dahîne erdê. Ew î bi şa nakê ku bi destê xwe di wir bigêhê, ji bo wê wî aseyê xwe ters çerxkirîyê û axzê asê ya xar giheştandîyê qûlpê beroşekê û ji ser refê ku dîne erdê.

Xaltîya Zêz(Zêzik, me navê wê kurt kiribû û digot Zêz), jî dixwazê ku ji wê hewese wî re bi manî be û wî ji evlegê bi derxe. Ku wê, ez dîtim, ew berda û hat li ber min gerîya »Bekoo qurban! Mehîle ku ma ev beroşê cîzê min bibe bifroşe«. Min, hu kiri bû. Perê (lîra, kayma) Allê xelasbûn, qabeka paxirî yê li rê. Yanî wa mîna dênklemê ku min li matêmatîkê xandîyê. Denklem jî usa yê. Perê Allê –(eksî, mînûs) = beroşek – (eksî, mînûs) yê li ser refê evligê, yan jî ji cîzê xaltîyê Zêz. Wa tiştekî ku bûyê rûtîn li we malê, ema min dîsa jî, bi derewa got »Apî All, tu çing qamîşe beroşê xaltîya Zêz dibî ku bibî bifroşî?« Wî ku dengê min bihîst di ser millê xwa çepê ra li min mesekir û bi burîyê xwe, (Bi jorda rakirin û dîna, çav qirpî) tarîf kir ku ez tewe we meselê nebim û wî rehet bihîlim ku ma ew berdewam ke. Bi rastî, îşê ku wî dikir î bi zahmet bû. Di wê nawberê da çengelê asê kete qulpê beroşê û qişand, danî erdê. Şa bûn û kêfê wî mîna ku li suretê wî hatibû niwisandin. Mîna hirçeka ku hengiv dîtî av bi devê wî ket. Xaltiya Zêz dîsa hucum kir. Le, nebû. Wî xaltî azar kir û got; »Ji malekê ra beroşek bes e. Ji bo



www.arsivakurdi.org

çi weqes kap-kacax?«Beroşa paxir li bin çengê wî derket der. Li ber malê bang kir.

»Bekoo, ware wir.« Ez, mahçûp bûm. Min, ji xaltîye Zêz fedî kir. Mîna ku min beroşa paxir dizîyê. Derketim derva kêfê Allê ez ji helînamê bin çengê xwe. Bi dengekî şa mîna dengê zîl-zengilê kerîk pez ku bihêrişe ser avê. Got; »Bi min ra ware ku em herin çarşîyê.« Min got: »Na, li qisurê min mêze meke, ez nikarim ku bi te ra herim çarşîyê. Ez î ji xaltîyê fedî dikime« Wî mîna ku îtîraza min nebîhîstibe û got: »De zû, zêde dirêj meke!«.

Ez û All berve çarsîyê ketinî rê. Wî, beroş ji çengelê asê bi der xist û da min. Li naw bajêr bi min ra got: »Tu, li tukanê Tilgirin Mêmêt derîyê min çavke«. Ez, li neskîyê tûkanê îştim û çû. Tilgirin Mêmêt î ji gundê tirkayê ew û All ê hewdu ji gûnd da nasdikine û nasê hev in, ez çûme cem wî. Wî, ku ez dîtim ji paş dezgeh da got »Ulaa gurban, hoş geldin yêgênim, nöörüyon eyîming« Ez, kenîyam û ketime tukanê. Min jî got »Merhaba Mêmêt emî! Sagol êyîm, êyîm. Ya sen nasılsın? İşler nasıl? Yengem Urxiye nasıl? Çol-çocuk, iyi mi?« Wî, di ber bersiv ê bange çiraxê xwe kir û bi wî ra got »Oolum, kop yel giming, aabene bi çay gap da gel« çerxe min bû got: »Ulla ey olmayıpda nöörecix, bundan kelli bostan olup göverecek halımız yok ya. Sen keyfine bak«.

Kursîk dirêje min kir ku ez li ser rûnim, di wê nawberê da muşteriyê wî hatin paşê çaya min hat, dura All hat bi suretekî bi ken û bi moralekî xwerde mîna ba yê xerîp ku kî hate ber wî ew î wî paç bikê. Ji Tilgirin Mêmêt ra bi desta îşaret kir (muşterîyê wî pir bûn) xatir xwest. Bi min ra got: »De rabe, em herin!«.

Em li kêlekê çemê Îkizarası da ber jêr, ber ve Dinekbağı diçûn û Alle ji min ra got: »Tu giran giran here li dawîyê bajêr derîyê min çav ke.« Sê-çar gav awitin çû û ji nûwa çerx bû hat û got: »Naa na tu jî bi min ra ware ku ez ji te ra dongdurmê bistînim ku tu bi rê da bixwî« Di pîyê min ra girt û ez di dû xwe va kişandim, ji solixekê bi şunda dawestî û pîyê min berda û got: »Tu vê tukanê nas dikî?« Qed îxtîyacîya wî bersivê min tunebû. Ji bo wê, bi xwe bersiv da xwe -»Tu yî ku li ku nasbikî! Ez ji te ra bejim wa tukana ya Kêbêlînîn Ökkeş e. Ew hevalê min î eskerê yî ji Îbîklîyê(gundekî tirka li ser rê ya Yerköyê) ye« Solixa xwe helîna bi şunda got: »Wî sê kes kuştin û bi genel afekê ji hepsê bi derket. Tirkekî rind e tu zerarê xwe bi kesî tunê« Ku em ketinî tukanê Allê dengê xwe rakir û got: »Nassın lan kêbêlînîn oglû ?« Kêbêlînîn Ökkêş ji paş dezgê bi derket hat xwe li Allê peça ew hembez kir û got: »Hoş geldîn



www.arsivakurdi.org



lan aşîrêt. Nerelerdesîn? Özletîyon gendînî« Hewdu hembez kirin All çû li paş dezgeh li sendelyê rûnişt. qasî vextê imre cixarekê runiştin li ber devîhew sohbet kirin û ez û dondirme ji bîr kirin. All rabû ji paş dezgeh bi derket û hate hêla min got »Tuu min temeli ji bîrkir ku ji te re dongdurme bînim!« Ber ve hewalî xwe çerx bû û got: »Ula pekmezcî,(li Kırşere navî Kurda hemû ula Aşiret û navî Tırka jî ula pekmezcî yê) bî kulah dongdurma verele.«

Em, bi kelekê çem de berjêr ber ve Dînekbagê diçûnî. Li ber dukanekê dawestî pere dane min û got: »Du tutun, kevrekî heste û pakêtek burunotu bistine«, du-sê gav awetin çû bi şûnda dawestîya û got: »bi perê ku maye jî şekirî akîde bistîne.« Çu kete dukana qasap, xwedîyê wê dikanê yî ji gundî me bû. Allê ji wî goşt bi deyn distand.

Ê ku li min tembekirî min sandin û derketim derva. Allê paketa goşt di desta î li ber qasep e goşt dirêje min kir em dîsa ketinî rê. Li dawîyê bajêr dawestîya li dor-alîyên xwe meskir û got: »Em li vir rûninî?«. Rûnişt.

Li axzê me yê rastê çêm di cihê xwe da bê deng dixweşîya, herdû hêlên wî darên qawaxa li axzê çepê çend darê akasyê di navberê darê akasyê fîdanê çam û mêşê teze danane. Li pêş me

girekî biçûk î di bin çeyirê heşinî de combûye. Di bin gir ra, rêka teng dirêj dibe ber ve çîyayê Kerwanserê re. Li dor rê gîyayê gesgesok, sirîyê çaw kesk, tek-tuk zarmasî û di sîhê wan de gîyayê din, parîyê mîyê, tekircan, emtirşik u.d. Li paşîyê me bajarê Kirşêrê, mîna ku kulawekî bawêjî ser çelikê dellekê qîl-wîlla wan di bin kulêw da bime û tanê dengê zuminîk ê ware. Zuminiyek ji kûrre da, ta ji binî erdê da ware. Ez jî li ser çehîrê rûniştim.

Allê, tebaxa tutûnê bi derxist û cixarek pêça solixeka kûr kişand û bi ser çem da puf kir. Min dondurme xelaskiribû û çawdikir ku ma All, musadê bi min de ku ez dev bi şakirê akîdê bikim. Wî, xwe qad ji wan deran nekir. Ku dûmanê cixarê belawbû şunda min dît, çavê wî li ser çîyayê Kerwanserê dawestînê û ew î di bin xayalada ye. Min, ne xwest ku ez wî ecz kim.

Mîna ku di xawê da deng bike: »Li wextekê… wexta ku ez î xort bûm« ber ve min çerx bû »Min kerîk pez bire Qersê«. Mîna ku min îmtîhan ke li çavê min meskir û pirsîya »Tu, dixwazî ku ji te ra qalê bikim?« Sohbeta Allê ji şekirê akîdê jî xwaştir e. Av, bi devê min ket. Min got: »Erê, erê«. Çavê wî dîsa çûne ser çîyayê Kêrwanserê dawestîyan.

»Berê, pir kes dihatin gundî me pez distandin. Pez pir bû û pezî gund î pirî çêbû. Ji bo vê yên ku bîstin, dixwestin ku bistînin ji tamizliqra. Ez ji eskerê nû hatibûm, hîn ne zewcîbûm. Du, kes hatibûn û ji malê xalê kerîyek pez standibûn û li şiwanekî digerîyan ku ma bi wan re berreber pez bibe welatê wan. Dê-bavê min ez bi wan re kirime rê.

Me pez him diçêrand him jî diçûnî. Em ê ji mehakê zedetir li rê bûnî. Ku em gehiştînî cihê wan, min heqê xwe helîna û wegerîyam, dîsan ketim rê.


Ez çend roja û yekcaran bi şew li bin şewqa heyvê çûm. Devdevî evarekê ez hatim binîyê gundekî, li kêlekê çemekî dawestîyam. Min derîya şewreşîyê çavkir ku ez di çêm da kincê xwe bişom. Ji sipîya min bi şunedikir ku bi rê herim. Her derên min dixwerîyan. Li hemperî çêm cec ê genim, cê, çewder, ka û sap hêbûn. Li paş xermana gund î li ber lingen çîya ki mexel hatîyê bêdeng rakketîye. Malê gund ê ji hew dûr in ne mîna gundê me li ser hev in.

Min, kinç şûştin şûnda rexistin û ez tazî, rût û ran çûm di nav sêp da min xwe dirêj kir. Hetanî ku kinçên min zîya bûna. Pir nekete navberê, şev reş bu. Min bi xwe- xwe got ez ê li wî cihî rakevim û sibê dere rê kevim. Ez î weng ketime xewê. Birbangê bi xişirtîyêkê ez bi xwe hesîyam ku

Li kêlekê min mangekê dikayê, qasî solixekê min li mangê serkir xewa min revîya. ez payî bûm. Pee..! Derlingê



www.arsivakurdi.org



kirasî min î junîya yî di devî mangêda ye, a wê dixwê. Min kire qîre-bar lê fêde nekir. Mange, ne bi tenê havalên wê jî kincên din xwarine. Ez bêçarê di naw sap de rûniştim û fikirîyam ku çi bikim. Min karar da ku hîn ku ro derneketîyê herim ji malekê kincna bixwazim ku ji rût-repalîyê xilasbim. Tu, li qederê mêzke, duhu min digot ez ê li malekê taştîyê subê bixwim û bi zik î têr derkewim rê.

Nuha, ez î ke kiras derpîyekî ji kesen ku nasnakim ricakime. Li davîyê gund qeraltîyê malekê helîna ber çava û nezîkî malê bûm, ez li ber xwedê gerîyam ku ma kûçik-mûçik tunebûna, bi wê ra bereber herd ji bin linge min qedîya û ez bi boşahîkê da ketim. Ku tirsa min rabirt bi şun da min bedena xwe qontrol kir ku tu derê min şikeştine an na!.. ›Şukur bi emre te ya rebbîî‹, min got. Li dor-alîyên xwe mêz kir ku ez î mîna Hz. Üsip di binîyê bîrekê da me.

Gundîyê wira sebê ziwistanê tiştê xwerinê di bîra da diparastine, ji bo wê her malekê bîreka xwe hebûye wa bîra jî

www.arsivakurd.org

ketîyê para min. Ez ê qaragûnî. Bi fedî û bêçarê, min bang kir û li şewreşîya binî bîrê mes kir. Kesî bersiv neda dengê minî reş, mîna qatranê. Min, dîsa bang kir. Wê hobê dengê min qêm bi derket. Qasî solixekê bi şun da yekî bi kirasekî gewr mîna kefen di ser bîrê ra dawestî û got: ›Tu, kî yî? Çi dixwazî?‹ Dengê jinekê bû. Jinikê bi kurmancî dengdikir. Min got: ›Xangê, li qusûrê min mêz meke, tiştek hatê serê min. Ez hatibûm ku ji we rica kim ku hûn kincna bi min din. Kincên min manga xwarin. Ez î tazî me, di şawreşîyê da çavên min nedîn û ez gerbûme bîrê.‹ Jinikê hîna nekir û got: ›Tu yî dînî… paqil î, niha mêrkî min ê ware ew ê te serjêke. ‹Ez dîsa li ber wê gerîyam, hekata xwe dîsa ji serî da ji wê ra kat kir. Dêmekî hîna kir. Xarwa hat destê xwe dirêje min kir ku, min bikşîne û ji bîrê bi derxe. Qûweta we negêhişt û ew jî lûl bû bîrê.

Bi qasî pênç dakîka em weng bêdeng mahçûp û bi fedî rûniştinî li binîyê bîrê. Paşê jinikê(jinka ku ez navê wê nizanim û bi kiras, lê bêderpe bi min ra di binîyê bîrekê da, di naw şewreşîyê mîna bextê min da dawestîye. Wê got: ›Birango, mêrkê min, duhû çûyîbû êş. Ew ê tenîkê bi şûn da ware mal. Tu yê bi nawî Xwedê kî ku me ji wê belayê xilas ke!‹ Ez ber ve wê çerx bûm. Yaa rebîî! Ew çi çiçik in? Ew  çi zik e? Ew çi zikê bi çûk e? Lê baldirr!? Û, ê ku di navberê da xayî dikir! Ez, bi emrê Xwedê zû çûme ferkê ku bi tiştên weng ra yaranî nêne kirinê. Çend mehanê ku ez ji eskerê hatime. Min di umrê xwe da qed jinên tazî nedîne. Meratî…

Min bi jinikê re got: ›Xangê, tiştê ku em bikinî em bi ecele ji wir bi dekevinî ku ma kes me weng nebîne‹ wê go: ›Erê erê. Lê çing bi derkewinî?‹ Di wê navberê da yêkî got; ›Çuuuş‹ ...! Jinikê go: ›Ey waax ew e.‹ Merik deng bîst û hat di ser me ra dawestî û got: ›Magê bênamûsno. Hûn li wir çi dikin?‹ Tiştî ku ez bibejim tunebû. Ortelix êdi sipî bûbû û wî didît ku em ê tazî di binîyê bîrê da li kelekê hewdu e. Mêrik bi têlaşê çû ji nîv dekîke bi şun da nûva hat li ser bîrê davestîya û di destê wî da kêr hebû, kêreka mîna şûrê Hz. Elî bi ser bîrê re xarwa bu û ji jinika xwe ra got: ›Were vir.‹ Di pîyê wê ra girt kişan bi dere derxist, çeketê xwe bi derxist awitê ser min û got: ›Ka ji min ra bibêje, tu li vir li çi digerî û rût-oran çi îşê te bi jinika min re, di bîrê da hê?‹ Kêr dirêjî min kir. Got: ›ku te derew kirin ez ê te serjêkim‹. Ji tirsa re min bi şunekir ku ez deng kim, diranên min şaq. şaq li hew diketin mîna ku ez bi cina ketibûm. Wext ji min re mîna ku bêdawî dihat, min got: ›Ez î ji Kirşêrê me‹ merik kire kîrrinî, ›Min ne bîhist te go çi?‹ Serê kêrê kuta bîrê, mîna ku



www.arsivakurdi.org




şewreşîyê kêr ke. Ez, li ber gerîyam min got: ›Birango, meherise! Ez î ji te ra hekate xwe bêjime, ku te hîna nekir, we wextê min serjêke. ‹Mîn a ku hatî serî min, ji wî ra kat kir. Mêrik qed tişt ne got û bang jinika xwe kir û got: ›kiras derpîna wune‹ Kiras derpê awetin ser min ku min ew li xwe kirin bi şun da, di destê min ra girt ez ji bîrê bi derxistim. Ji min pirsîya; ›Mange yêka çing bû?‹ Dît ku min fahm nekir carek di pirsîya ›Manga ku kincên te xwerî rengê wê yî çing bû?‹

Min ji wî ra tarîf kir û cihê ku xerman lê min kat kir wî bi jinikê xware got: ›Zu, here wê mangê ji min re wune, vir.‹ Bi min re got: ›Tu jî ji şûnê xwe melive.‹ Zatî halî ku ez ji şûnê xwe bilivêm tunebû, junîyê min dihezîyan. Ew, kêr di destê wî da di ser min re dawestî û ez î mîna lawkê Hz. Îbram ê ku ware serjêkirin weng bi tirs çavdikir. Jinik bi mangê va çerx bû hat. Merik hucum kir, kêr avite zikê mangê, hûr-pirtikê mangê ketin erdê, çu hûrê wê qalaşt di naw dûman-buxê da kirasê

www.arsivakurd.org

minî junîya xayî kir. Min nefeseka kûr kişand. Mange hîn nemirî bû. Ku wî kiras dît gumana xwe pêhat ku ez î derawa nakime, giran giran mîna ku tamê jê bi derxe çû serîyê mangê jêkir, çenkire holê û bi min ra got: ›bicehimê ji wir, ma çavên min te nebînin!..‹

Min li paş xwe mêsnekir ketime rê«. Allê, çavên xwe ji ser çîyayê Kerwanserê helînan û giran, giran anî li ser çêm danî û weng dawestî. Mina ku ji nezerê Allê veciniqîn qorrek çûçikê ewra ji ser dallê qawaxa firrîyan çûn li kelekê çêm, li ser kûmê daniştin. ji axzê bajêr da jinek dihat. Ro giran, giran xatir dixwest, wergerîbû axzê roava. All, ji nişkava rabû kenîya min tişt fahm nekir. Ku ez çerxbûme wê axzê min dit. Ew jinika li rê, ji rê bi derketibû ber ve me dihat. Allê bi min ra got »Ez ê ji te ra paşê bahskim ku ew kî ye. Ez, ne yî mîna te me ku di naw kitap-defterê hîşk de bijîm. Li kêlekê min mehaqaq tiştekî nerm û germ î ku hêbê wekî di qed wa jîyanê dine derew tê kişandine« Pakîta goşt, burunotû şekirê âkîdê(ji min ra yek bile nîşt ku bi rê de buxwim ma teselîyê min ware) helîna, ber ve jinikê çû. Ku hatine cem hewdû jinikê di destê wî ra girt danî ser pêsîra xwe ya çepê û got: »Te pir çav kir ruhê min?«



Allê li min mêskir, bi mêskirineka bilind, bigurur got,

»Tu jî giran giran derkewe rê. Tu ê ancax herî mal«

Min xatir ji wan xast, ketime rêya mal. Bi rê da min ji xwe dipirsîya wî qerf bi min kirin? Çi derewa bikim min ne dixwast ku tiştekî weng hîna bikim. Şûna şekirêâkîdê tame hesûdî qisqancîyê li ser zimanê min ez bi kêleka çêm da çûm.

# DEREWÎN

Seyfi Doğan

Li ber camîyê piçekê li ba kalan rûniştim. Kalan li ser serpêhatîyên xwe sohbet dikirin û bi piranî jî ji xortanîya xwe behs dikirin û bi wî awayî, extiyerîya xwe ji bîr dikirin.

Kalan pir caran, şor çerx dikirin tînan ser avketinê û diketin rûyê hevdu. Bi hevdu re digotin; çî ye te dîsa derdorê malê şil kiriye!

Herkesekî li xortbûna xwe digere. Wek Gilgamiş û Faust. Hevalê min î delal digot; ji bo ku merî, tim xort bimîne, garek: ”di devî marekî de, cê birişînî. Denê wî cêyî ku di devî mêr da ruştî, her sal jê denêkî bixwi”.

Demekê rûniştim bi şûn da, ez ji ba kalan rabûm. Li nav gund, li şopên xwe geriyam. Şopên xwe yên kurikîyê. Şopên xwe yên xortîyê. Wexta min ê bêxemî. Li demeke ku jîyanê bedawî bû. Wextê ku saetan kar nedikirî û xwîn wek rojê dikelî.

Dûnê bi insanan şîrîn e. Dûnê bi insanan qelew e.

Kaniyê Malê Utê yê micikîye. Kaniyê Malê Şêxê şunê guherandine. Kanîyê Kûrikê hêdî û hêdî diherikê. Kanîyê jêriyê rewsîyê bûyê pûş û palax. Kanîyê Malê Hecê yê li ber micikînê ye.

Çîyayên hing li cîhên xwe ne. Lê ji bîr mekin! Ji çîyayî beşaxila da dest pê kirin ku piştê çîyan hûn in herdê. Lê xwedê nanêke bi destî rastê da ku; kevirên çîyê, ji rê asfaltkirinê re nebûn.

Li nav gund demekê geriyam bi şûn da, çûm dukana Memî Malê Utê.

Milê Heseyî, hevalê minî delalî ki yî bi tenê li ber dukana Memê, li ser çalî genim rûniştîye. Min jî xwe da ser çêl. Ezî di xûyê da reş bû me.

Kamyonek derbas bû.Tentî kamyonê heta dev tiji tişt û ser tişt jî însan rûniştî bûn. Kal û pir, keç û xort, jin û bûk. Kamyonê em di nav toz û dûmanê da hiştin. Memê got; ew komyona Hesenî Mêrdinê ye. Hersal ê tên. Ê weng li wê germê, der bi der digerin û ci kar dibe yê dikin. Piranî yê nîskan an jî  kîmyon bi destan diçinin.

Milê ji min pirs kir; ji ku de têyî, ku da herî? Min got; hevalê delal. Tu dizanî! Xerîbî ye, hesreta heval û hogira û bîra mal û welat kirine ye.

Hasretê wek kozîyêk agir e. Herkî meri pifê kir, pêtîyê pêl û pêl bibin û te bişewitînin. Êdî ax û av fêda neka.

Min got; ez ê ji xwe re tenekê li nav gund, bi pêya çerx biwim û hasretîya xwe



www.arsivakurdi.org

derxim. Dema ku ez peya digerim, ez î tamê ji gund heytenim.

Merî der û dora xwe dibinê. Merî rastê insanên ku te bi salan nedîtîye tê. Cihên lê listîme dibînim. Bihnên ku min ji bîr kirine yê têne bîra min. Kevirên ku li lingên min lêketine û xwin kirine rastê têm.

Germiyê tîrêjên rojê. Tinê axê nerm. Listekên tîrêjan. Sihên xanîyên kevnên yên dramatîk. Ronahîyêke ku pê ewlê min xenê dike.

Milê got; ê ê te çi dît, çi nedît?

Memê Malê Utê ji dukanê derket. Silava xwe da û li ser kursiyê kinikî ku şikestî rûnişt. Memê pirskir; hûnê çi wexwin? Ez gelek tî bibûm. Min av xwest Milê jî coca cola.

Gund hatîye guherandin. Ne wek berê hertişt di bin destên merîya da ye. Herder xanêyên ji beton û harimê di dor re cexkirine û herime pênekriyê ser diwarî herimê jî bi telênsirî xemilandine!.. Yek ji wanan jî ez im. Ma xeberê we jê hebe.

Berê hemî gund ji kurikên re cîhê lîstikê bû. Lê îro zarok tenê di nav harimên xwe de dîlîzin. Helbet hertişt tê guherandin. Bêguman gerek tişt werin guherandin. Lê, li ba me, guherandin bi lezî birûskê dibe. Loma, harmonîya civatê jî xerab dibe.

Ji kekê xwe re bême çi. Di ber aşî xalana xwe, Usî Elî Haydar re derbas bûm. A were birê te, ji xerman heynenê bi şun da, derdorê êş mina bazarekê dibû. Îro zindîyek li dor alîye êş tune bû. Ne kurikên ku bi kaw dilîstên, ne çûcikên ku li hebê genim digerîn, ne erebên hespên gundên cîran, ne jî keçik û bûkên bi heftreng kinc li xwe kirî û gulîbûnî!..

Henek tişt jî min nexwast ku ez bibînim. Berde! Ma ew wek berê di giyanîyê min da şûne xwe biparêzên. Ez otantîke xwe ku di navbere min û tiştan û insanan de heye wenda nekim. Berde! Ma tilsim û cenneta ku min ji xwe re dagirtîye ma di mejoyî min da bijî. Berde! bîhnê nanî teze û axê ku serî sibê, bîhnê şilîyê jê dihat, ma di ruhî min da cîyên xwe veşêrin…

Kadirê Eşê Elî hat ba me ruûnişt. Bi heycanekê rast û ji hundir da kala romana xwe ya bi navî "Hamoli Bizans Saraylarinda" kir. Memê soda ikram Kêdîr kir. Soda xwe wexar bi şûn da rabû berve camîyê çû.

Kadir çû bi şûn da me henek komentar kir. Ki em ê hing di wê da bûn, du law, li piştên wanan tûrêkên tiji genim li ber dukanê Memê pêyda bûn. Wexta zevi çinînê kurik ê peya terin nav zavîyên nezîkê gund û ji xwe re genim berhev dikin û tînin li dukanan ji xwe re bi tişt didin an jî heqê genimê xwe wek pere distînin.

Li ser merdîwanê dukanê, yêkî li sala wan kurikana xwe gihand yekî ji wana û got; magî derewin.



www.arsivakurdi.org

Ez mat bûm dawestîyam. Ne ku ez wan pêyvan îro dibhîzime anjî min ew pêyvanan nedizanîn. Na! Di wê demê da û li wî cîhî, ew pêyva bi min pir hêja hat. Bi min, mina xezînekê bû. Bi rastî jî xezîneke ku neyê pîwandin.

Hezar salan bi şûn da, li gundê Xelika, li ber dukanê Memî Malê Utê, li ba min Milê Hesê, zimanê Avesta dibihîzime. Ew zimanê Zend Avesta ye. Ew zimanê ku însanan bi kêmasî 2500 salî ber wê li kuçên gawastîyê deng dikirî, ez î dibihizim!..

Xezineke ku ez 2500 salî paş da birim û ez li ber dukanê Memê bi dîroka xwe re, bi koken xwe re, bi zimanê xwe re, bi dinê xwe re û bi nasnama xwe xwe re hunim ba hevdû û jîyana min qelew kir.

Ew pêyvên tarîxî, kanîstankên (çavkanî) filîlojî û etimolojîya zimên in.

Ji bo ku însanên ku nuha dijîn û nesilê pêş me mîrasçandîyê(kewneşopî) xwe wek kanîstankên zanînê bi kar bînîn û gerek merî mîrasçandîyê xwe biparêze û neqil ke.

DEREWIN

Mazdaîzm -Dînê Zerduşt-Li ser du prensîban hatîye dagirtin. Rindî û Xerabî.

Xwedêya xwe Ahura Mazda ye.

Rindi Spenta Mainyu û xerabîyê jî Angro Mainyu temsîl dike.

Felsefa Spenta Mainyu Aşa ye. Yanê rîya adîl, ronahî û agir e. Bi murîdên Aşa re dibêjin aşawan. Felsefa Angra Mainyu-drug(druj) yanê bêheqî, xizanî, nezanî û tarîyê ye. Bi murîdên drug re digotin Derewin.

MAGÎ

Peyva magî îro negatîv tê bikaranîn. Lê eslê xwe, ji dînê Medan da têye. Navî dînê Meda Magî û ruhbanê xwe magar bûn. Ji însanên ku murîdê dînî magî bûn re, digotin magî. Li gorê dinê magî; meri bi kuweta sersiruştê dikane tesîr li ser dûnê bike.

Wek nimûne: berê li gunda dema ku heywanek wenda dibû devî gur girêdidan ku ma gur heywanê nexwe.

Peyve magi îro li ewrupê wek magisk, magie, magic û li Rojhelata Navîn wek sihîr tê bikaranîn.

GAVESTÎ

Gavastî warên ku di gunê dînê Zerduşt re, gundî lê bi cîh bûn re hatiye gotin. Warên ku nêzikî gomên ga an jî li nav gomên ga de ye.

Gavastî, ji du pêyvan pêyda bûye; GA û ŞÎTÎ.

Ga; apelativ e. Yanê ji bo tevayî deware(büyük baş hayvan) û bo merga ku ga lêdiçêrin jî tê bikaranîn.

Şîtî jî mena cîh e.

Gavestî li Kurdistanê navî eşîreke mezin e. Ziman zindî ye û prosesek e û wek her zindîtîyêkê tê guherandin. Çimkî yên zimên bikartînîn ê zindî ne. Gavaşîtî jî hatîyê guherandin û bûyê gavastî.

Zanayê rojava ku waqifê dinî Zerduşt in mana gavaştî yê wek Cîhê Ga (bi tirkî -inek yeri) werdigerînin.

www.arsivakurdi.org

# SUCÊ BÊ BEXŞÎ
## (EZ Ê EF NEKIM)

ji serî sibê da heta berêvarê
yekî dest bi çoyî
zimanî me tixesînê
û bi tirsê ruhî me dixemilînê
yekî dest bi çoyî
ji tarixê numûnê nîşanî me dide
û wênan rêber me dike
em ê mîna yek dîna li ser hidûdan
digerinî
em ê navekî dinivîsînî
ne carekê ne du cara
hezar û hezar carî
yekî dest bi çoyî
gulîyên keçiken ku
her yekî wek kelekî genim hetine
bûnûnê
bi tirpanê diqusînê
yekî dest bi ço yî
her roj me di erdê da dikê xwarê
û dibê gilîyê hevdu bikin
û tirsê giyanî me kotîn dike
yekî dest bi çoyî herroj
me dide sonda û dibêje
tûke şîrî xwe kin
yekî dest bi çoyî her roj
me gunehkar dike
û li newalê hînom dişewitînê.

Seyfi Doğan

www.arsivakurdi.org

# Çen gotin li ser cejna Newrozê

Wêk tê zanîn di hundirê Newrozê da 21ê adarê (612 B.Z.) pir tişt hene.

1) **xilas bûyîn(azad bûyîn.)**

2) **Damizirandina Împarotorîya Medan,** 612 B.Z va tarixa dibe destpêka salnamêya kurdan û hemû arîyan (iranîyan)

3) **Destpêka biharê**

Va salnamê (roja nû) li gor hereket kirina royê (güneş takvimi) roj û sal hatîye çêkirin. Salek 12 meh in. Şeş mehên pêşîyê 31 roj in. Çile(çileyê paşîn), sibat, adar(avdar), nîsan, gulan û hezîran. Pênç mehên din jî 30 roj in. Tîrmeh, tebax, îlon, çir û teşrîn. Ê dawîyê yanê meha kanûnê(çileyê pêşîn) 28 roj in. Lê her çar salê carekê meha kanûnê dibe 29 roj. Yanî her çar salê carekê rojek li salê zêdê dibe. Ew jî tê dikeve meha kanûnê. Ev sal (2008) dibê 366 roj.

Lê çi mixabê ku kurdên me yê Tirkîyê, bi taybêtî jî kurdên Anatolîya Navîn sersala xiristîyanan an jî sersala eraban ji xwe re saleke nu dibînin û li hev pîroz dikin.

30 december 2008

# Eşkîyayek*

Dibêjin carekê eşkîyayek hebû, navê vî Alo-Dîno bû, herêma Cezirê xirab kirî bû. Hemû gundan talan dikir, agir berdida gundan û xwîn dirijand. Mîrê Cezîrê ca dikir ku wî bigrê. Axir, paşê bi gelek zehmetî ew girt û li ser bîryar da ku, wî bişewîtîne. Lê bele hêdî bi hêdî. Alo di bin agirê da jan dida, lê tû hawar nedikir û bi agirê xwe va dihat vemirandin. Di vê demê da Mîr pirsa halê vî kir û got: Alo! Heye li dunyayê, li halê te xirabtir û ezab?

Alo bersiv da û got: Ez benî, halê min ne gelek xirabe, lê belê ezabek heye hîç ne xweştir e. Ew jî ev e ku mirovekî mîvanek je re were û tû xwerin(şîv) tinebe ku ber mîvanê xwe dayne û ew û jina xwe serî daxin ber xwe.

Mîr bi vê persivê Alo ecepmayî ma. Mîr têgêşt ku Alo mirovekî bi namus û kamal bû û hacet kir ku xilas bike, lê bêfeyde! Alo di vê demê da vemirî.

---

**Grammaire Kurde,L'Abbé* Paul Beidar.
Librairie orientaliste Paul Geuthner.1926,

Jordan



www.arsivakurdi.org

# MIN TU NEDÎYÎ

Mem Xelîkan

www.arsivakurdi.org

Gundekî Anatolîyê yî şêrîn. Li deşta Konyayê, pişta xwe li çîyan. Gundî giştik bi cîranan ve wek dost û bira bi qar û bar, bi alîkarî û dost û hevaltî dijîyan. Hetanî Melle Îbram, hate gund. Du mizgeftên gund hebûn. Li yekê, Melle Silêman melletî dikir. Çend salan şuva, dewletê Melle Îbram, ji mizgefta din re şande gund. Melle Îbram, cara siftê bû dest bi wezîfê dikir. Dewletê ew bi maaş şandibû û ew memûr bû. Di serê wî de pir tiştî xweş û rind hebû ku ji gundîyan re rêberîya olî (dinî) bike. Pirs û pirgirêkên civatê yên olî, bi fikirên serê wî de hetanî pê zanî û hetanî zimanê wî lê gerîya, dixwest bersiv bide û wana ji bîr û bawerîyên batilî bi dûr xe. Dixwest gundîyan, bi rastîyên olî yên bi fikir û rastîyên ew dizane, perwerde bike.

Meriyekî durust û sernerm bû. Li hember mezinan bi edeb bû. Ji bo wê jî, zû xwe bi gundîyan da hezkirin. Lê vaya li hesabê Melle Silêman nedihat. Çend sal in bi serê xwe, bi tenê cemeat dibir û dianî Silemên. Li malên eznî, quran û fatîhe dixwend. Mevlûd dixwend, cendên (meyît) miriyan dişûştin û ji bo vê jî gundîyan pere didane wî. Bi ser de, gundîyan fitr, zekat û sedeqeyên xwe jî didan wî. Melle Îbram, li hember erf û edetên weng bû. Digot:

– Ez ji dewletê ji bo xizmetê ku ez dikim, maaşê digirim. Van yên hûn teklif dikin ne heqê (maf) min e.

Ne li cend(meyit) şûştinê, ne li quran xwendinê û ne jî li mewlûd û ji bo miriyan xetim daynanê, tu caran pere qebûl nedikir. Vaya, bi gundîyan xweş bû. Cara siftê bû, melleyekî weng dîyîbûn. Bi wê re jî textê Melle Silêman dilerizî. Bi wan, gotin û kirinên Melle Îbram, rehetîya wî direvî û bêhuzûr dibû. Ji bo Melle Îbram, li nav gund û cemeatê got û go dikirin.

Melle Silêman digot:

– Îbram, ne melle ye. Dibe ku ew bi al şandibin gund. Gotinên wî

û kirinên wî wek yên qomînîstan e. Demekê şûn da gundî bûn du perçeyan. Her perçekî alîyê mellekî digirt.

Rojekê ji cemeata mizgeftê Hesen got:

– Îbram Xoce, Vaya yê tu dikî ne rast e. Kurikên te hûr in. Huro tu bi maaşê debara xwe dikî. Lê wexta ku kurikên te mezin bûn mesrefe te ê giran bibe. Her Melleyek çing ji bo xizmetê ku dike, pera digire dixwaze tu jî bigirî. Vaya li herda me, ne eyib e.

Melle Îbram got:

– Na, na ew ne heqê min e. Ez bi maaş kar dikim. Ez nanê heram nedixwim û ne jî bi kurikên xwe didim xwarin.

Melle Îbram, li her weaz û cemeetekê, ji bo wezîfe û ferzên misilmantîyê, yên ku wî rast dizanî, vikasî zimanê wî lê digerî tîna ziman. Wek: Hec, ferzeke olî ye. Ji meriyên dewlemend re ye. Rojî, ji meriyên sax û bi sihet re ye, ne ji meriyên nexwaş re ye. Lê wî dizanî yên zikê xwe bi qar û bar têr dikin xizan jî, ga û golikên xwe difiroşin û diherin Hec. Li her cemeetekê, ew tiştê cemeatê bi şaşitî dizanî rexne dikir, digot:

– Misilmantî, ne va ya ye. Xwedê ji merîyên xizan Hec, ji nexwaşan rojîyê naxwaze. Her ferzek, ji bo yên gûca (qam) xwe gêştî re ye.

Lê ev gotinana, ji cem Silemên û yên ku li hember Melle Îbram ve, tim û tim li dij vî dihatin bikaranîn.

Hesen, biryara xwe dayîbû ku here mala Xwedê. Melle Îbram dema ev bihîst, banga Hesen kir û jê re got:

– Hesen, kurikên te dixwînin, birayekî te yî nexwaş heye û bêpere ye. Pereyên toxtor û dermanan, cîran û heval di navbera xwe de berhev dikine ku wî bişînin nexwaşxanê. Tu guh bidî ser min, alîkarîya birayê xwe bike. Ew li cem Xwedê hê meqbûl e.

Lê vaya qet neçû xoşa Hesen. Ew jî ji Îbram Xoce bi dûr diket. Wî jî bi devê Melle Silemên li nav gund dest bi qeremeta kir. Bi gundîyan re digot:

– Melle Silêman bi heqe, Îbram Xoce ne meriyekî rind e. Naxwaze ez herim Hec. Vaya yî eşkere, ferzên Xwedê înkar dike.

Bi fîtefîtkirina Melle Silêmên û got û gotên nava gund ve roj derbas dibûn, Îbram Xoce li nav gund bi tenê dima. Cîran, heval û cemeat ji dor wî belav dibû. Ew hê ji ya xwe bi şûva nedima. Lê êdî navê wî li nava gund, derketibû wek melleyê

gawir û qomûnîst. Rojek havînê, kele kela rojê, roja înêyê. Cemeat, li mizgeftê berhev bûye. Melle Îbram, dest bi waazê kir û got:

– Cemeat, hûn jî dizanin, wexta xermana ye, her yek ji we bi kar û bar e. Ez dixwazim huro nimêya înê bi lez bikim û we zêde li vira negirim. Cîranino, berîya Xwedê de tu pere tunen bide we. Herkesek here ser kar û barê xwe û şuxila xwe bikin. Ji bo hûn rizqê zar û zêçên xwe peyda kin.

Ev gotina li serê wî her çû, bû bela. Naxwazên wî û şuxila Melle Silêmên, va gotina li nav gund carek din kirin got û go. Melleyê me, her diçû heval û cîranên dor alîyên xwe wenda dikirin. Sal derbas dibûn, Kurikên Melle Îbram mezin bûbûn. Lawê wî yî mezin, dest bi dibistana bilind kiribû. Melle ji bo debara dinê, hêdî hêdî diket tengasîyê. Li nava gund, bi fîtefîtkirina Silêmên û bi got û go û qeremetan li dor alîyê wî kesek nemabû.

Melle nimêya nîvro kir û diçû maleke eznî. Seri di ber de. Bi xwe û xwe, di serê xwe de difikirî. Lawê wî yê ku li zanîngahê dixwand pere dixwastin. Lê tune bûn. Ya herî neçê, kesekî here bi dên pera jê bixwaze jî li dor alîyê wî nemabû. Çû li mala eznî rûnişt. Ji mirî re fetîhek xwand. Seri di ber de bi xwe û xwe difikirî, qet bi cemeetê re deng nedikir. Serê wî li ser lawê wî û pereyên dixwaze bû. Seatekê şuva, quranek xwand û misada xwe xwast. Li ser sokanê merasê xwe dikirin lingê xwe. Ji mala eznî, yekî destê xwe kire berîya xoce û bi derxist. Melle qet xwe ji tu dera nekir. Bi rê de, dest avite berîya xwe, mês kir pere kirine berîyê. Bi wê xenê bû û wek barekî giran ji ser milên wî dêhatî fireh bû.

Dû wê rojê ve, Melle Îbram jî wek her melleyekî, li malên eznî ji bo quran xwendin û bo ceneze şûştinê, ji bo miriyan xetim daynanê pere digirtin. Jiyanê an jî civatê ew jî dikişande derekê.

Lawê Hesen 45 salî bû. Bi nexwaşîyek bêçare çû ser heqîya xwe. Ew li gund bi alkol wexwarinê dihat nasîn. Alkolîk bû. Hesen banga Melle Silêman kir. Ji bo meyît şûştinê.

Silêman got:

– Ez naşom. Ew merîyekî alkolîk e. Ne caîz e ku ewana werin şûştinê.

Dûwa Hesen ji bo li nava gund lawê wî û ew neçê nebe, banga melle Îbram kir. Îbram hat û ew meyîta şuşt. Lê li gund hate rexnekirin. Îbram Xoce ji bo xwe biparêze di-



www.arsivakurdi.org

got:

– Ne xema min e, kê alkol wexwarîyê an jî çi nerindî kirîye. Ez perê xwe dizanim.

Dû vê va jî, Îbram Xoce rehetî nedî. Wek wana bûyînî jî ew xilas nekir. Melle Silêman, bi dest Hesen ji bo Melle Îbram, xeber da dozger(savcı) qezeyê. Ji bo Melle Îbram gilî kirinê.

Hesen çû, got:

– Melleyê me Îbram, bi pera cendan dişo. Vaya, sûc e. Em dadgehkirina(yargılanma) wî dixwazin.

Dozger xeber da melle Îbram ji bo were dadgahê û xwe biparêze. Îbram, çû cem dozger.

Dozger pirsî:

– Dibêjin, tu meyîtan bi 1500 qeymeyî dişoyî. Rast e?

Melle Îbram got:


– Erê, rast e. Ez bi 1500 qeymeyî miriyan dişom. Lê ddozgerê min, ku ez 5000 qeymeyî bidim te, tu ê nava şeqên min bişoyî?

Dozger:

– Here, min tu, nediyî. Te jî, ez.

---

Necatî Gezen bi albuma xwe ya nû derket nava guhdarên xwe.
Necati Gezen ji kurdên Anatoliya Navîn, ji Hecîlera ye.
Ev albuma Necati Gezen ji 13 stiranan pêk hatiye.
Jê deh sitran bi kurdî û sê sitran jî tirkî ne.




**Album:** ÊDÎ BESE WERE
**Stranbêj:** NECATÎ GEZEN
**Hejmara sitrana:** 13
**Studio:** Studio Yildiz
**Sal:** 2007

www.arsivakurdi.org

# VÊ MALÊ ŞEŞ LAWIKÊN XWE HENE

Ahmet Gezer

Wana bixûrê te şerjêkirin.

- Jê bipêrse bê kînge şerjêkirin?

- Dayê kînge şerjêkirin?

- Wextêk ez bûm bûk.

Vê malê şeş lawikên xwe hebûne, du bira li ser meselekê tên hemberî hewdû yek yekî dikûje. Bi ser vê bûyerê de dayîka lawikan, bi şev û roj digîrî û porê xwe dirûçkîne, rûyê xwe ji xûnê ji jor de dadixe ser qirîka xwe. Meh û sal derbas dibin, dayîka malê her tim di vê halî da ye. Gorê ku behsa bûyerê dikin di konê reş de dimayîne, kurd wê wextê hîng nû hatine vî arê xwe, yanî Anatolî Navîn.

Bi vê arê re dibên arê Malê Kûsîk ji navçê Încovê.

Xerîbê nezanî û bêçareya dayîka malê ji vê tengezarîyê dernaxin. Wê çaxê hekîm, loqman û bijîşk(doktor) jî zêde nayên zanîn. Dayîka malê bi ser vê meselê de dîn dibe û aqlê xwe wenda dike. Çiqes zeman û wext derbas bû nayê zanîn.

Rojekê kerwanek di cih û arê wan re derbas dibe, ji wan birana du ji kerwanê buxîrekî(heştîre nêr) jê vediqetînin û didizin. Berê ku hêştirê şerjêkin, dibên dîya me ya bêja(katke).

Yek dibe were em alekî (oynêkî) li dayika xwe biknî. Serê dayika xwe dişon û porê wê şe dikin. Cil û bergê wê acer lê dikin, xêlîya wê bi ser serê wê de dixên. Lawikek, dayîkê li pişta xwe sîwar dike û di dor alî konê reş re digerîne û dikin tîlîlî. Dayîk dipêrse dibê va çi ye? Lawikê wê dibên em te dikinî bûk.

Hêştir şerjêdikin, her çiqes bixwerek be jî nêkarin hêştireke bi hev ra bixwin û tevakin.

Piştê çend rojan mêze dikin, yek berva konê û arê wan tê. Texmîn dikin ku ew kesa xwudî bixwerî ye. Heman kon û arê xwe bi ser xwe de hêldiweşînin û destê xwe di ber xwe ve dikin. Berhenga mêrik diçin û dikin oy bavo, oy biro li jûnîyên xwe dixin û mêrik pêşwazî dikin.

Mêrik matmayî dimîne, mêrik dipêrse dibe çi bû û çi bi serê we de hat? Dibên birayê me mîr, me got tu

www.arsivakurdi.org



jî hatî şîna birayê me ji berve va em hatinî berhenga te. Mêrik dibê ma serê we sax be, teqdîr û Îllahî Xûdê ye. Ma hûn û baqî paşî xweş bin.

Mêrik gavekî li ba wan rûtine, ji dûwa xatirê xwe ji wan dixwaze. Wana dibên, are te xêr bû û şer bû? Mêrik dibê derdekî min jî heye. Bixwerekî min tûne, ku ji kerwan veqetî an jî kesî bir û dizî nizam. Mêrik dibê we qet nedît? Ku va çû, kê bir û hena şerjêkir?

Dayîka wan dibê, lawîkên min bixwere te şerjêkirin.

Mêrik vedigere dayîka wan, ku bêpîrse wê çaxê lawikek heman peş dikeva û dibê.

Heta hîngê lawikek dibe gûh medê dêya min, wê bi ser mirina bira min de aqlê xwe wenda kir û dîn bû.

Lawik bi mêrik re dibê, ji diya min bipirse be kîngê şerjêkirin.

Mêrik dîsa jî hîna nake, ji dayîka wan dipirse, dibê: dayê lawkê te kînge hêştir şerjêkirin?

Dîya wan dibêje wexta ku ez bûm bûk.

Mêrik mez dike jinik şestûpenc û heftê salî ye, dibê wextek bûyî bûk. Mêrik piştê xwe dide wana û bi rê xwe de diçe. Dayîkê aqil wenda kirî ve jî, lê lawikê xwe ji belakî jî xelas dike.

Ev mesela li Încove lê malê Kûsîk qewîmî, Ûwîşê Malê Kûsîk li cemaat û oda qal dikir. Lawîkê wê Mihemedê Ûwîş ji min re qal kir. Min jî ji we re şîrove kir û nivîsand.



www.arsivakurdi.org

# Oy oy etê

Amedekar: **Gursel Dayan (Qemerî)**

*Ev strana "Oy oy etê" di nav kurdên Anatoliya Navîn de weke sitraneke gelêrî bi nav û deng e. Gelek dengbêjên ji navçe vê sitranê dibêjin. Gursel Dayan tev gotinên vê sitranê, notayên wê jî amade kiriye. Em amadekirina vê sitranê ji bo we xwendevanên hêja diweşînin. Red.*




Oy oy etê, oy oy etê oy oy etê
Dilêm kete keçka metê
Keçika rindê dilêm ketê
Birin dane dane lawkê xelkê

Rindam dane lawkê xelkê
Serê dil xençer lêketê


Ava bîrê germ û kelî
Li ser pê bû hezret Elî
Ez çûm dest lingê wî kalî
Got dilê te ma dinya wî alî

-girêdan-

Rê gundî me gî mermer e
Tu di ser re here û were
Xortek bi dilê xwe nezewicî
Mirin jê re zêrê zer e

-girêdan-

www.arsivakurdi.org







**Şoreş Reşî** bi navê *Dîroka kurdên koçber* berhemeka bi du cîldan derdikeve pêş xwendevanan. Kitêb li ser koçberiya kurdan hatiye nivisîn. Nivîskarê kitêbê Şoreş Reşi ji kurdên Anatoliya Navîn e.


Herdu cîldên berhemê bi wêne û nexşeyên rengîn in. Piraniya wêneyan niviskar bi xwe kişandine û ji bo vê lêkolîn û lêgerîna xwe du seferên Xorasanî kiriye. Di van seferên xwe de bi kurdên wan deveran re peyiviye, wêneyên cih û warên wan ên koçerî, dîrokî, cografî û bi detayên balkêş cilûbergên wan kişandiye.

**Cilda yekem** ji destpêka dêmaniyê heta serdema kevirî, koka kurdan, ariyan, tofana Nûh, hûrî, mîtanî û heta serdema moxol û Tîmûr tê. Cîlda yekem bi formateke mezin bi qasî 300 rûpelan e.

**Cîlda duyem** jî ji serdema osmaniyan, hemû êl û eşîrên kurdan hene: Kîjan eşîr koçberî kuderê bûne, bi awayekî berfireh hatine nivisîn. Cîlda duyem jî herweha bi formateke mezin 331 rûpel e.

Kitêb di nav weşanên Înstîtuya  Kurdî li Stockholmê de derketiye.


www.arsivakurda.org




Piştî *Bihuşta Lal*, Selahattin Bulut bi "*Xadim*"a xwe derket pêşberî xwendevanên xwe. Xadim noveleka dirêj e ku bûyereka zîndaniyekî piştî zîndaniyê ji xwendevanan re vedibêje.

Selahattin Bulut bi zimanekî saf û sade, psîkolojiya zîndaniyekî bi hemû rastî û detayên rûhî ve radixe ser rûpelên kitêba xwe. Rastî û ruhiyetên ku her zîndaniyek nikane bi serbestî bahsê bike.

*Xadim* ji aliyê
Weşanxaneya Avestayê
li Îstenbolê derketiye û 90 rûpel e.




**Hesenê Alê** bi romana xwe ya nû pêrgî xwendevanên xwe dibe.
Romana Hesenê Alê
bi navê *"Sêwiyên Rojhilat"* ji aliyê
Weşanxaneya Stil Offsetê ve derketiye.
250 rupel e.

**Ev hejmara jî tê de, ji vira ha kovara me bideng jî li ser CD tê weşandin. Kes an dezgehên ku bixwezin, dikarin sparişa xwe wek abonetiya bideng bidin.**

www.arsivakurdi.org







Piştî kar û xebateke demeke dûr û dirêj Amed Tîgrîs tecrûbe û zanebûna xwe ya gelek salên mamostetiyê di kitêbekê de berhev kir:
*Perwerdeya bi zimanê dayikê û pirzimaniya fermî*. Ev kitêba mamoste Amed Tîgrîs ji du beşên lêkolînên esasî pêk tê:

**Di beşa yekem** de Amed Tîgrîs li ser giringî û fonksîyonên ziman, kar û kelka perwerdeya zimanê dayikê, encama asîmîlasyon û jenosîda çandî, zimanên mirî û yên li ber mirinê, zimanê fermî û perwerdeya bi zaravayan, komên zimanan û li kîjan welatî bi kîjan zimanî dipeyivin, dîrok, sedem û encamên îdeolojiya yekdewletî, yekneteweyî, yekalayî û yekzimanî radiweste.

**Di beşê duyem** de jî li ser prosedur, statû û pratîka sîstema dibistanan li dewletên pirnetewe û li Swêdê perwerdeya zimanê zikmakî çawa ye û di çi astî de ye.

Mamoste Amed Tîgrîs ev berhema xwe "*Perwerdeya bi zimanê dayikê û pirzimaniya fermî*." bi kurdî nivisandiye û herweha bi xwe jî ew wergerandiye tirkî. Tirkiya wê bi navê "*Anadili egitimi ve birden fazla resmi dil." e.*
Herdu kitêbên Amed Tîgrîs îsal ji aliyê Weşanxaneya Apecê ve hatine weşandin. Kitêb bi reng û bi qasî 120 rûpelan e.

www.arsivakurdi.org

# GİZLİ BELGELER IŞIĞINDA DERSİM'DE KATLİAM VE ASİMİLASYON

Mehmet Bayrak

## Giriş

Kemalist yönetim, daha 1930'lu yılların başlarında hazırladığı gizli ***Dersim Raporu***'nda; kimi Osmanlı yöneticilerinin de görüşlerini dayanak yaparak, Dersim katliamının altyapısını hazırlarken, katliamdan sonra hangi aşiretlerin Batı illerinde hangi belde ve köylerde iskân edileceğine ilişkin bir listeye de yer veriyordu.

Bazı muhbir-gazeteciler, çoban kılığında Dersim yöresinde gizli araştırmalar yaparken; kimi Elazığ Halkevi temsilcileri de, halk arasına karışarak, sözde etnolojik ve folklorik derleme yapma adına halkın malvarlığı, insan gücü ve silah sayısı konusunda da tesbitler yapıyordu.

Mustafa Kemal'in, bu ön incelemerin ardından 1936'da yaptığı şu açıklama, bir askeri manevra bahanesiyle 1937 yılı sonlarında başlayacak katliamın adeta habercisidir: *„İç işlerimizde en önemli bir safha varsa, o da Dersim sorunudur. İçte bulunan iş bu yarayı, bu korkunç çıbanı temizleyip koparmak ve kökünden kesmek işi her ne pahasına olursa olsun yapılmalı ve bu hususta en acil kararların alınması için, hükümete tam ve geniş yetkiler verilmelidir.“*

Dönemin Başbakanı Celal Bayar da, gerek o dönemde gerekse daha sonra yaptığı açıklamalarda bu katliamı açıkça itiraf eder : *„Dersim'de birtakım hareketler olduğunu duyuyorduk. O sıralar askeri menavralar vardı. Mareşal Fevzi Çakmak bu manevraları idare ediyordu. Bir haber geldi. Eşkıya bir karakolumuzu basmış; bazı askerlerimizin, jandarmanın tüfeklerini almış..Du-*

www.arsivakurdi.org

*rumu Atatürk duymuş…Beni çağırdı. Durumu biliyorsun, gerekeni yap, dedi…Hemen işe başladım. O gün Dersim'i vurduk…"* (Akis der. Sayı:13/ 1987)

Burada, Dersim olayını bir „eşkıyalık" olarak sunmaya çalışan Celal Bayar, bundan bir yıl önceki bir açıklamasında ise şöyle demektedir: *„Dersim İsyanı tamamen Kürtler'in siyasi düşünceleridir. Bunlar ne anarşisttir, ne şudur budur. Bunlar doğrudan doğruya müstakil Kürt hükümetini kurmak istiyorlardı."* (Tercüman gaz. 10.9.1986)

Bu katliam devam ederken, Kemalist kalemşörler şu iddiada bulunuyorlardı: *Şefkat ve merhamet gibi en yüksek insanlık duygusuyla hareket edilmemiş olsaydı, Dersim onbeş günde tamamen yok edilebilirdi. (…) Son Dersim hadisesi, ordumuz için bir manevra, kötü düşünenler için bir ibret sahnesi olmuştur."* ( Elazığ Halkevi /Altan Dergisi, 28 Eylül 1937)

Üzerinde durulması gereken ilginç hususlardan biri, döneme ilişkin belgelere ve Atatürk'ün, Dersim'i bizzat bombalayan ( Ermeni asıllı) manevi/pilot kızı Sabiha Gökçen'in açıklamalarına rağmen; bazı kesimlerin, hasta yatağında olduğu için Atatürk'ün bu katliamdan haberdar olmadığı yolundaki garip iddialarıdır. Oysa, Atatürk, 1 Kasım 1938'de yani ölümünden yalnızca dokuz gün önce , Başbakanı Celal Bayar aracılığıyla Meclis'e gönderdiği mesajda, katliamın tamamlandığını şu sözlerle açıklamaktaydı:

*„Uzun yıllardan beri süregelen ve zaman zaman gergin bir şekil alan Tunceli'ndeki toplu haydutluk olayları belli bir proğram içindeki çalışmalar sonucu kısa bir sürede ortadan kaldırılmış, bölgede bu gibi olaylar bir daha tekrarlanmamak üzere tarihe aktarılılmıştır."* (Hıdır Göktaş: Kürtler/ İsyan-Tenkil, 1991,s.141)

Şunu özellikle vurgulamamız gerekiyor ki, 1937/38 Dersim olayı, bir isyan değil; gerçek anlamda bir katliamdır…Yukardanberi anlatılan acılı gerçek karşısında, büyük Kürt yurtseveri **Mehmed Nuri Dersimi'** nin şu sözünü birkez daha hatırlatalım:

*„Yüzyıllardan beri hep yenildiğimiz, hep ezildiğimiz doğrudur. Ama en az bunun kadar doğru olan bir şey vardır ki, o da direnişten asla vazgeçmediğimizdir…"*

www.arsivakurdi.org

# ZIMAN Û ZAROKÊN ME HEBÛN Û PÎROZÎYÊN ME NE!




Ji bilî zimanên din û ji bilî pirtûkên mezinan, weke Weşanxaneya APECê me heta nuha zêdeyî 80 pirtûkên zarokan bi zimanê kurdî weşandine û bêguman ew jî bi zaravayên zazakî, soranî û kurmancî ne. Pirtûkên me ji zimanê swêdî hatine wergerandin ji bo zarokên 3salî heta 16saliyan jî dikanin bi zimanê xwe jê îstîfade bikin.

apec förlag

**Navnîşana xwestinê:**
Box 8121
163 08 Spånga/Sweden
Telefon: 0046 (0)8 761 81 18
Fax: +46-8-761 24 90
E-mail: orderapec@telia.com

**Navnîşana xwestinê:**
Muzaffer Özgür
Postfach 900 348, D-51113 Köln
Telefon: 0049-172 298 24 51
Fax: 0049 (0)2203-30 16 30
E-mail: birnebun@hotmail.de




E-post
**info@birnebun.com**
Internet
**www.birnebun.com**